

PIRS

Kovareke
rewşenbîrî
serbixweye



Hejmar - 3 - sal - 1 - çirya pêşî - 1993



Sûnwarê Koçka mîrê Behdîman li zaxo.



Serecem

Di şûna pêşgotinê de	Pirs	2
Tilî li ser birîna «Tilî»	Tengezar	3
Rûpelê Cegerxwîn	Dilovan	9
Bang	Pirs	10
Tilûrê bêgane	Azad Elî	11
Nûçeyek	Pirs	13
Romanayên perîşan	Ismaîl Dêrsimî	14
Kalê Satiya	Rêberê Robarî	16
Sirûdên şermok	Bextreş	18
Sê ramûsan	Hoşeng	19
Stranek	Awaz kalo	19
Dêwêñ rûres	Rûxweşê zîvar	20
Ji rewanê palo re	Nûhat	21
«Kî» û «Kê» çine?!	D.Abdilfetah	22
Ronîkirineke zimaneranî	Berzo	24
Kîvrokê tirsonek	C.Reco	31
Tu namirî — Mihvan	B.Candar	32
Hevpeyvînek bi hunermed Aştî	B.Gedro	33
Mirinê «Ferîde xanim» jî ji me istend	H.Gundî	37
Osman sebrî	Dilawerê Zengî	39
Namek ji dîrokê	Pîr Rustem	42
Stranê Folklorî	M.H.Darı	43
Pirs dipirse		45

Wêneya bergê pêşî ya hunermed Behzad Gedro ye.

Nirx: 40 L.S. Dervayî welêt: 3 dolar.

Di şûna pêşgotinê de

Komîta ber pirsiyara kovara pirs vexnenamék bi pênivîsa ARO - Rezo wergirt. Bi kurtî rexnê li ser karê kovarê, di warê pirbûna şaşıyan de digre. Tê de dibêje:

«Berpîrsiyarê çap û pêkanîna jimara didiwan jî kovara pirs ê, sê şaşıyên serkarî, di hêlinâ talan-kirî, û kevoka min, de kirine. yek ji wan ziman û rîzimanê wan wêran kiriye. Yek jî sînor û kenarêن yase û rastnivîsê hilanîne. Ya dawî jî ewe, ku çîrok û helbest herdû ji kok û bingehêne xwe hatine hêrivandin».

Rexnename berdewam dike:

«Em xweş dizanin, ku du derdêne her nivîska reki wilo ji nivîskavêne kovara pirs hene, yek jî wan ewe:çawa xwendevan bi rûpelên nivîskar ve bê girêdan, û pê re mijûl bibe, ya din jî ewe, ku xwendevan karibe bi serbestî, serfirazî û bêrêl kaş vê nivîsandinê, vî berhemî, wergire û pê behwer bibe.

Dêmek, pêvegivêdan, wergirtin û pêbehwerî, sê regezên herî hîmîne li ba nivîskar, wilo jî li ba xwen-devan. Loma berhemên van şertan pêk bînin, gereke bi zimanê xwe sivik, rewan, durist û hêja bin. Bi behwerî û ramanên xwe jî dilovan û xweş bin da karîbin cih di dilan de bigrin. Belê gelo di vî warî de kovarê me, û ji wan kovara, pirs, van şertan pêk tîmin? Em dikarin bi serbestî û bê şerm û fedî bêjin: na.

Ü ji ber ku na ya me pir hişke, serkarêne kovanê me dikevin bin barê lixwepirsîneke dûr û dirêj de, ji ber ku hebûn û nebûna kovarêne me bi vê ye kê ve tê girêdan. Eger em guh nedin nivisan dinêñ nivîs karêñ xwe, û serkarêne kovarêne me, berpîrsiyarê çap û pêkanîne, bi dilsarî li karêñ xwe guhdar bin, wê rew-şa kovarêne me ev rewş be. Wê zimanê wan gel?û kelêj be, wê şaşıyên zimêñ û rîzimêñ pir bin, wê gotin û hevokêne me riji û pûc bin. Bi vî rengî kovarêne me ti karê durist nakin û nikatîn pêşveçûnekê di warê xebata xwe de bikin.

Kavarâ, pirs, jî bi bêxîretî kilk û xamêne nivîskarêne xwe, di jimara didiwan de li navbera kovarê rast kirine. Hemî rengîn şaşıyan di berhemên nivîskarêne xwe de hîstîne. Ne tenha wilo, lê pirên van berheman bêkîrtir kirine ji yase û rêz û ben-dan derxistîne.

Piştî rê vexnenamê, me gazîk û hêvîk hene. Gaziya me ewe, ku nivîskarêne kovara, pirs, xweş guh bidin nivîsandin û berhemên xwe di warê rastnivîs, ziman û rîziman avakîvina hîvokan û pelik û xêzên xweşik û pagij de. Hêviya me jî ewe, ku ev bêguhdanî nema derbas bibe û berpîrsiyarêne kovara (pirs) bi degelî van kîmasiyân di ji marêne pêşde hilînin û bavêjin.

•Pirs•

Tilî li ser birîna «Tilî»

Berî ez dîwana «EHMED HUSEYNÎ» ya binavê «Bi xewna we pênûsê dilorînim «bibînim û derkeve min di jimareke «Armanc» de helbesteke wî binavê şestîlî xwendibû ewê demê ez pir pêşabûm û kêfa min hat û min di hundurê xwe de got: dema helbesten wilo derbêñ ewê kilasîkêñ me zimanê wan lime kinbibe. Ji hinga ve ji minre meraqbû ez nivîsareke Ehmed bibînim. Dema min dîwan dît kêfa min bêhtir bû


Ev dîwan di sala 1993 an de li uppsala ji weşanêñ jîna nû derket piştî min ev, dîwandît min, xwest ez lêkonînekê li ser çêbikim (pêwî-ste nelêklînek kilasîkîbe)

vêca ez li gelek lêvger û pirtûkan vegeriyam û xama min xwe amadekir.

Lêkolînek li ser hemî helbestên dîwanê ewê gelek rûpel û dem bixwasta ji ber wilo jî Min lisér helbesta «Ti-Lî» nivîsî ya ku min li jor li ser danî.

Ev lêkolîn tu buhayî nade Helbestê lê xwe nêzîk dike dikeve hundurê wê.

Lêkolînek wilo rêbazekî tewrîk jêre divê. Ez naxwazim bi rengekî akadîmî bi nivîsim ji ber wilo ezê li ser her xalekê teka teka Tewrîk û bikaranîn binivîsim (ji bilî listekarê) Ev lêkolîn li ser avahiya heyberî mezine (structur)



1 - Asta serrast (seresere): Di vê asteyê de, em li ser deng na peyvin ji berku ew bi xwe mijareke.

- Zimanê helbestî: Em dixwazin pirsekê bikin û bersiva wê jî bidin. Ma zimanê helbestî û nehelbestî heye? Ziman dibe helbestî dema ku lihevsiwarkirinek nû peyda dike ew ziman ji yê xurustiyê cudabe. Nimûne : Bejna keçkê bedewe

Ev lihevsiwarkirkinkî normale ,lê dema em bêjin: (Bejna keçkê nalîna avêye). Me ev lihevsiwarkirin nûkir, wateyekî nû da, me xêza serast guherand.

Em werin helbesta xwe «Tilî» û lihevsiwarkinê wê bibînin «Tiliyên ku bi kesera dîrokê hinekirî dilerizîn «r 95». Ev lihevsiwarkirin xwe ji zimanê normal dûrxistiye xijiqandinek zimanî heye şeya zimên diyar dike û vebûneke nûye deriyê liberberketinan li pêş (peyambar) vedike.(رسول الله).

Helbestvan di helbestan xwe de «Tilî» pir bêjeyên, pir wate, pir nîşan bikartîne, zimanekî lihevsiwarkirinî bejna vê helbestê dixemilîne. (Binefş, şilanperest, cengperest, kevizgirtî, şûnsop) pirtirîn hevokên vê helbestê sazumanen rêzimanî şkandina

mîna (Evîndar bi girî , bi kûrekûr bîna xwe vedikinî (tiliyên ku bikesera dîrokê hinekirî dilerizîn ^{r 95}).

Hevoka yekem: 1 + 3 + 2 + 4

Hevoka diwem: 1 + 3 + 2 + 3

Dema ku sazumana hevokê dişke, nîşan û wateyên wê pirtir û firehtir ditin.

Li hevsiwarkirin: lihevsiwarkirinê nû naverok û durvê helbestê nûdikin. Di helbesta «tilî» de em dibînin ku Ehmed xwe ji lihevsiwarkirinê cûtî azad kiriye, em (şox û şeng û şepal şérînê nazenînê...) di helbestê de nabînin, lê li hemberî wê em lihevsiwarekiranen ku mirov ji nîşka ve Vediçinqîne dibînin, mîna:

(Xewnperest – naveroka xewnê nifirê bêcirû kevizgirtî-Bajarekî ji berfê...). Em dibînin ku ev lihev siwarkirin «dûrbûnên lerizî di afirînî^{r 95}, ango tevgerên jihev cuda di hundurê heyber de ava dikin. Ev dûrbûnên lerizî ji pêwendiyêne peyvan, yên dijraberî dihundurê heyber de çedibîn ji ber wilo jî nîşanên heyber xurtir kûrtir dibin, cîgehê hest li cem danar^{r 95} wek li cem dangirt^{r 95} dilivîne. mînak:

(Kenê bêdeng...). wek em diza-

nin ken deng jêre heye, li vê derê helbestvan me dilehayî dihêle, û dûrbûnên lerizî di afirîne. Di helbestê de lihevsiwarkirinê wilo pir hene (kela seqemê...).

- Wêne: Wêneya helbestî tevgereke hişî di hundurê hest de tê damezirandin.

«Vedengekî himbize ji hemî leqên xurustê, civakê, û cûreyên wan, û hindek serpêhatiyên taybetî têne parastin⁽²⁾» Eger em bifirehî li ser wêneya helbestî bi peyivin, ewê bixwe mijadek bo lêkolînekê be, ji ber wê jî em naxwazin texlîten wên-eyê bijmêrin, tenê emê bêjin: wêneya xurt, ya ku du asteyên wê hebin (du alîne) 1 - asteyekî hesteyî 2 - Asteyekî nehesteyî «sîberî».

Ehmed di parçê pêşîn ji helbesta «tilî» de pir wêneyê helbestî bikartîne, belam ew rola wêneyê baş dinase. Di parçê yekem de ev

A-

Wêne hene 1 - Kenê bêdeng

2 - Bahozâ şit û kawik

3 - tiliyên... bi kesera dirokê

Hesteyî sîberî «ab-straktîv»

B- *sîberî*
 1 - Nifirêñ kevizgirt.(Abstraktîv hesteyî)
 C- *sîberî sîberî*
 1 - Nifirêñ bêcir.(sîberî sîberî)
 2 - Naveroka xewnê... heyîn rist

Wêneyêñ celebê yekê xwendevan ber bi mijûliyê de dibe, lê dergehê vê mijûliyê nefirehe, çimkî leqek ji yên wêneyê hestewere.

Celebê didwan dangir kêfxwes dike , ji ber ku tiştekî sîberî diguhêze hesteyî, bêhnê li xwendevan fireh dike

Celebê sisiyan dangir dibe asîmanan, wî difirîne, dixe atomsfêrekî nexurustî de. Xwendevan diweste ta bigihe ku xwesteka nivîskar nasbike.

Em werin bi rengekî din wêneyekî bişirove bikin

lehiya	kor û şît
lehfîrtoneye	rengdêrên mirovane ne, yan ji lawirane
<ul style="list-style-type: none"> - Av ♦ Béhiş ♦ Malxirab - Bi niş 	<ul style="list-style-type: none"> - Bi çav ♦ Kor - Bi hêz - Bi tirs ♦ Malxirab - Mêr - Comerd - Bi hiş -şît ♦ Bê hiş

Helbestvan rengdêrek ji yên mirovan an ji lawiran bijartiye û hevoka xwe sazkiriye. Ev wêne ne ji hersê celebêñ me li ser wan nivîsiye, ev herdû asteyên wê hesteyî ne, û ji rengdêran ava bûye,

ji ber vê yekê qelsiya wê berze ye
Weneyeke normale tiştekî di hundurê me (min) de nalivîne.

Piştî asteya serast hat kolan emê werin nêrîna nivîskar jê derxînin bê ma ew çi dirame? çi dibîne? çi dive? çi...?

Ehmed mîna her kurdekî hestwer bi êşen gelê xwe di eşe, dibîne ku hebûna wî dileqe, bi xurtî diheje « Tiliyên ku bi kesera dîrokê dilerizîn ». Ehmed wek nîv melakî doza rabûnê dike « Pêwîste tilî jîndarbin ,Pêwîste tilî livdar bin ». Ev dibêje kê? Bang dike kê? Ez bawerim ev goft û go ji miletê wî reye.

Di dawî de Huéynî ji hêvî û omîdên xwe neraziye netenê, wilo, belam bêhêvî dibe. «yara. ji têr nebû «Laşê» li camiya mezine».

B - Asteya kûr (serjêr): Di her heybereki de parçeyên bingehînî û parçeyên çêbûy hene.

- parçeyên bingehînî evin: a - Dem - b - cîgeh - c - kesayetî
- Parçeyên çêbûyî: - Hevheyber (intertext)

A - Dem: Ci heyber be, demên wî hene, ev dem li gor dirûn û karekterê helbestvan dertê.

Em werin binêrin bê ma Ehmed ci dem di helbesta xwe «tilî» de

bikaraniye di parçê yekem de car-
caran dema buhûrî bikaraniye, û hef caran dema beşdar (nuha), û du car ji bo pêşerjê. Di parçeyê diwem û siyem de dema bihûrî qet nîne

Wek em dibînin Ehmed dixwaze xwe ji demên buhûrî, qilêr û qirêjiya wê, azake, lê nikare, ji ber ku êsike kevne di hundurê me de, ev bixwe sedemekî mezine ji biserneketina tevgerên azadî xwaz Wek diyare hêviyên Huseynî wilo mezin nînin. Asoyekî vekirî li pêşberî xwe nabîne Lewra wisa ji dema pêşerojî pir bikarneaniye.

- Cîgeh: Ehmed pir cî di helbesta «tilî» de bikaranîne, xwe ji ciyekî pelû dike ciyekî din, mîna pirpirîkekê ku dinav gulîstanekêdebe [Giyan, xewn, Dîwarê bêdeng, dilû, cerg, bîbik, Aşê evînê, lêv, pî, welat, poz Qeraxê cîhanê werzê, tirsê, camiya mezin...]

Dema ku mirov bêhêvî be cîhan tev li nik wî wek heve doşeka xwe li her cî radixe

Ehmed jî mîna pirpirîkekê ku di nav gulîstanekê gulên wê cilmisîbin debe, ji vê bifire, li ser ya din deyne, lewra bêjeyên cî tevî kul û derd û janêن Ehmed bûne.

-Kesayetî: Dema em bibînin ku

dem xirabe, cî tijî stirî û kelemin, helbet ewê kesên vê serdemê û vî cî neberbiheve bin

Di parçeyê 1ê de, doza xebatê ji kesên xwe dikê [pêwîste tilî jîndarbin, pêwîste tilî livdarbin]^{R.93}

Di parçeyê 2 wan de, doza kar ji bo welat dike, bo navê wî bicrise: [Navê welat... qalind bicirisine]^{R.94}

Di parçeyê 3 an de, cengek di nav bera xêr û şer deye
[Mirovêñ cengperest yên ku... berbangê dikan]^{R.95}
[Mirovêñ- binefş- şilan perest... didin ber pozêñ jiyanê]^{R.97}

Parçeyê 4an axaftinek peyvîniye nivîskar di nav rastî û nerastiyê de diçe û tê [Di wê neqeba teng û tentika de... dinixumand] [Çavêñ bi dû... diçûn]^{R.98}

Parçeyê 5an dixwaze ku kar xurt bibe, di xewnan de dijî, lê di dawî de xewn beravêtî dibe.

[zengil- difûre..- Mirîşk- piştâ wê welat xwe vedizî -yara- têrnebû...]^{R.99}

Nivîskar li bendî ferzendekê ye ku sûdekê jê bibîne, lewra pirsê li dû pirsê ji lehngan dike

[ANKÎDO. SOKRATO. ZERDEŞTO.]^{R.100}

Diyaloga di parçeyê 7an de çêdibe dixwaze jîndariyekê li dar

bixe, lewra sozê dide [Bivan jîndariyê li darxînim].

Kesên parçen 8an lihev dikevin, bixwere nagihin, tu karîbikin. [Hê laşê şes tilî li camiya mezine!...]

Hevheyber (intertext): Hebûna heybereki yan jî gelek heyberan di hundurê heybereki de, jêre tê gotin (hevheyber) ne tenê ji hêla naverokê ve, lê ji hêla (hevok raman, teknîk, avahî) dejî.

Zanîna vî karî du tiştan dixwaze.
1 - Gencînek rewşenbîrî xurt linik rexnegir.

2 - Hebûna heybereki hêja û bihêz

Bêgomân ev kar nehêsanîye, ji ber ku wilo lêkolîn hewcedarı kesên akadîmîkin.

Ehmed Huseynî mîna pir ji van nivîskarêñ cizîrê akama Selîm Berket, lê heye, bi kêmâsi zimanê wî, lê Ehmed xwe Dîlê wî nehiştiye, ne jî yê şêrgo û R.S.Husêñ. Ehmed di efsanan de baş jêhatî xuya dike, û ji mere jî diyare ku Ehmedî ji felsefa ZEREDEŞT û destana cilcamêş sûde dîtiye.

Akama (Şêrgo) di peqandina wateyan de lê xuyaye [Eger rondik.....]^{R.101}

Pêwîste tilî livdar bin.] Ev dibis-

tana cak Birîvêre. Di warê felsefa Zerdeşti de me li jor dabû xuyakirin. Ehmed di vê helbesta xwe de, di destpêkê de, xwe xurt dike sûnda dixwe, bo welatê wî xweş-bibe, kesên wî jiyanekê bi rûmet bijîn, lê di dawîde, destêن xwe diber xwere berdide.

Di dawî de em dibînin Ehmed di cihnan de dikeve pexşaneyeyeke xurû, dûrî helbestiyê dikeve. Minak [û bi tiliyekê...]

Wek em dizanin hevokên helbestê himbizin

Di gelek caran de Ehmed xwe dûrî wateya peyvê, ya ferhengî nake.

Tengezarê Marînî

Jêder :

- 1 - Fî elşî riyeh K.E.Dîb
- 2 - Al sûra Alşî riyeh fî elxîtab el neqdî we belax welî Mihemed

Têbînî: ev têrmên me bikaranîna ji bo dan û standinê ne

Eger têbînên xwendevanê hêja li ser wan hebin hevîdar in ku rêbikin kovarêن heyî bo, gotina rast cî bigire

Kurdî	Ingлизî	Frensi	Erebi
Rêbaz	style	style	اسلوب
Avahî	structure	structure	بنية
Avahiyeti	structuralism	structuralism	البنيوية
Lihevswarkirin	composing	composition	تركيب
Hevheyber	intertext	entretexte	تناس
Dijraberî	antinomy	antinomi	تضاد
Xwarkirin	alteration	alteration	تحريف
cîgeh	space	espace	فضاء - مكان
Nişanker	signifier	signifiant	دال
Nişan	signification	signification	دلالة
Helezî	taste	goût	ذوق
Wêne	image	image	صورة
Siber	imagination	imagination	خيال
Peyamhinêر	Addressee	destinataire	مرسل اليه
Peyam gir	addressee	destinataire	مُرسل
Nişanbar	singificatum	signifie	مدلول
Rexnegir	critiker	critiquer	ناقد
Heyber	text	texte	نص
Rêbaz	Methode		منهج
Danar	thrower		ملقى
Dangir	recipitor	recipievrê	ملتقى
zarav (Fer E.Eqrawî)	idiomatic	terme	محضال
	expression		


المصادر - المجلات -

- 1 - الموقف الأدبي العدد ٢٢٥ - ٢٢٦ - عام ١٩٩٠ من ٤٩ و ٥٩
- 2 - الموقف الأدبي العدد ٢٦٥ عام ١٩٩٣ من ٢٢
- 3 - المعرفة العدد ١ - ٣٠٢ - ٢٠٢ - عام ١٩٨٧ من ٧ و ٨٩
- 4 - المعرفة العدد ٣٥٠ - ٣٥١ - عام ١٩٩٢ من ٨٦

- الكتب -

- 1 - انثربولوجيا البنية ليفي شتراوس
- 2 - النقد الأدبي في القرن العشرين جان ايف ناديه
- 3 - النظرية الأدبية الحديثة ديفيد روبي وجيفرسون
- 4 - النقد والعلوم الإنسانية جاك لوبياس
- 5 - الصورة الفنية د. نعيم الباقي
- 6 - د. جابر عاصفون
- 7 - محمد مفتاح دينامية النص
- 8 - محمد خطابي لسانيات النص
- 9 - جوليانا كريستيانكا علم النص
- 10 - رومان ياكوبسن قضايا شعرية

Rûpelê Cegerxwîn



Di dema Edîb şîşeklî de, sala 1952, zordarî û çewsandina kesen pêşverû pir bibû, herweha gelek kes hatin girtin, û ketine zîndanan de, ji alîkî dî ve jî gelek kesê bazdayî hebûn, ku (el-mektebil san) li wan digeriye ji bo wan bêxê gitixanê, yek ji vayêñ bazdayî M. Cegerxwîn bû, yê ku xwe di mala Silêmanê şekiro de veşartibû, şekiro muxtarê gundê Navkurê bû, rojavayî bajarê qamişlo, bi 10 kilometra. Lê mixabin yekî soloxder çûbû ba polis, û li cegerxwîn hildabû.

Sibehekê zû, piştî şeveqê, silêmanê şekiro ji xew rabû, daku limêj bikê, dit ku polis li dora gund bûye xelek nahêlê kesek ji gund derkevê muxtar rabû xwe nêzîkî neferekî kir û jê pîrsî ev ci meseleye, yê nefer lêvegerand, û got em hatine yekî bazdayî bigirin, ew jî cegerxwîne, û xwe di vi gundi de vesartîye.

Silêman rabû bilez vegiriye, û çû ba cegerxwîn, mesele jêre got. Helbet pêşî herdû ketin heyra de

Di 22.10.1993 an de, (9) sal bi ser koçbûna seydayê hêja Cegerxwîn derbas dibin.

Di vê birhatina han de, em careke ditir dengê vî goşeyî hildidin, bihêvîne ku xwendevan û nivîskarên govara pîrsê arîkariya vî goşeyî bikin, ku serpêhatî û helbestêñ neçapkîrt, û her tiştê hûn zanibin derbarî jîyana cegerxwîn ji govara (pîrs) re bişînin.

govara pîrs

ka wê çilo bikin, ji nişkê ve ramanek hate bîra s. şekiro, û gote cegerxwîn, Rabe zû berî ku Polis dest bi teftişê bikê, xwe bêxê pişt malnivînê, ta ez bêm yekser S.Şekiro bazde cem govanê gund, û wî anî mala, xwe û rabû cil û çaroxa wî jêkir. Dûvre cilê gawan li cegerxwîn kîrin. Dîse muxtar berê xwe da cem esker, û çû ba berpiryarê polisan, û gotê: «ez muxtarê gundim we xêre? hûn ci ji vi gundi dixwazin? Serekê polis lêvegrand û got:

- Çenabê kes ji gund derkevê, yan jî werê gund, Jiber cegerxwîn divî gundi de ye, û divê em wî derxin, û bigirin. Ica emê iro gund ji hev bixin da em cegerxwîn bigirin, S.Şekira gote serokê polis:

«me bixwe cegerxwîn nedîtiye û ne libameye û yê ev xeber ji we re gotiye derewan dikê û

vaye gund li ber weye, lê bes em yek tiştî ji we dixwazin, ku hûn bihêlin çelek û golikê me derkevin, ji ber ku carê di vi

wextî de berî roj hilê garan derdikevê û bera gavan wan derxê êdî hûn texsir mekin gund mal bi mal liber weye û ezê ji bi were bigirim. È polis lêvegerand û got: bere garan derkeve, lê ê gavan çenabê. S.Şekiro gotê, ez benî garan bê gavan tucarî nameşê, û hûnê çi feydê ji gavan bikin. È polis di xwe fikirî û gotê, bere garan û gavan tenê derkevin

S.Şekiro zû vege riye ba cegerxwîn, û çirok jêre got, cegerxwîn biya wîkir û garan golik û çeleke dan ber xwe û berê xwe da newala bakur, û paşê dev ji çeleke qeriye û newal newal çû, taku sîno- rên xeter xilas kîrin.

• Amedekirina Dilovan •

BANG

Herdem di dîrokê de wergerandin di warêن wêjeyî, çandeyî û zanistî de, dibû eger û sedma pêş- ketinêن mezin. Bo vê yekê wergerandin dimîne beşekî herî giring di pirtûkxanêن cîhanî de, û toreya wergerandinî, dibe bingehekî pir xurt ji toreya miletan re.

Lê mixabin ku pirtûkxana kurdi ne tenha belengaza pirtûkêن zimanê xwe ye, lê wilo jîfeqîra toreya cîhanî ye. Loma rola wergerandinê di zimanê kurdi de, ji wêje û çanda cîhanî pir giring û hêja ye. Û em bihêvîne ku nivîskavêن, pirs, ê wê guh bidin vê dozê.

Em li hêviya wergerandinêن we ne, bi rengekî giştî ji toreya cîhanî û bi tabetî ji toreya erebî, çirok helbest gotar û y.d.

Pirs

TILÛRÊ BÊGANE^(*)

Yan Mircanê Qure

Bîhna kurdîtiyê ji çirokan dibare

TILÛRÊ BÊGANE

Redwanê Ali



•• AZAD EHMED ELİ ••

Bi xwendina vê riste çirokê, careke din tête xuyakirin ku çiroka kurdî li nav kurdên sûriyê roj bi roj pêşdikeve, û bingehêن xwe hunerî û zimanî ava dike, çi ev pêşketin li Deverêن kurdî be, û çi li derveyî welêt be.

Pertûka Dr: REDWAN ALÎ ji çend çirok û kurte çirok pêk hatîye:

«Tilûrê bêgane (66 rûper) ev çirok li ser Jiyana xortekî kurd li feransa hatîye hûnandin. Û li dor jiyana penaberî birengêki giştî dipeyive.

Muhra Muxtêr têde Doza bênifüsêن kurd li sûriye tête xuyakirin.

Kurte çirokê din bi tevayî li ser doza kurdîne li sûriye, Ji hemî alîyan ve Jiyana kurdan ya civakî û siyasi ruhnî dike wek çirokê (civân, resûl, seyro, xîj-xijoneko).


Dinav van çirokan de, xwêner li hember çiroka R.Eli ya dirêj tilûrê Bêgane, di raweste û dirame, çîmkî ev çirok bi xwe nîv romaneker, ji alîtên teknîki û hunerî ve Têde jiyana xortekî kurdê sûriye, digel ku vê yekê zû nade xuya kirin, li firansa xuya kirin dide, ew jiyana sar ya penaberî yê Xebata wî jibo standina mafê penaberî yê, (Laci siyasi) roj biroj, di çirokê de dirêse.

Xortê me navê wî Mircan e li Bulgaristanê bûye Diktor di kurdo logya yê de, ji wir ne di şîya ku berê xwe bide welêt rabû xebat kir ji bo standina mafê penaberî yê ji dewleta firansî. Bi vê kurtiya geleki kurt, ez dikarim xîzên stûr yê çiroka «tilûrêbêgana» bidime naskirin. Lê dinav ban xîz û bûyerên serane de gelek rewş û raman û hûr wêneyêن jîyanî hene. Çirok xweş tête xwendin, û têgehiştin, di hisê mirov de dimeyê, wêne kêşıya kîlikêن li evropa baş nivîskar, di çirokê de, hisûk kiri ye. Lê mixabin zû xwêner di hesê û agehdar di be ku ev çirok serpêhatî ye Ango bûyerên wê bi tevayî rastin!

Cire? ji ber ku jiyana nivîskar di dawîya pertûkê de çapbûye. Rista bûyerên bi ser nivîskarde derbas bû ye, ew bi xwene yênu ku têne serê Mircan di çirokê de.

Dise nexeme, çîmkû di dîroka wêjeya cihanî de gelek romanên bi nav û deng wênek bûn ji

jiyana nivîskarê wê,vêcyea pêdivî ewe,ka çawa nivîskar ji wan bûyeran û serpêhatîyan çirokek huneri wêjeyî hûnandiye. Di bawerî ya minde nivîskar giheştiye pêpelûkek bilind ji avahiya çirokê ya huneri. Têkelî yên huneri di nav bera Bûyeran nivîskar Qehreman basbûnandîye, û hevbendi di nav bera wan de avakiriya ta çirok xwe rakiri-ye asoyê karekî wêjeyî:



Di çirokê de ne tenê jiyana redwan xuyakiriye, lê belê mirovekî din di nav xîzên çirokê de aferandi-ye. Ew bi xwe mamoste Mircan e.

Di çirokkirina vê serpêhatîye de nivîskar bi serketiye.

Ango karî ye Bûyerên jîyanê biguhêze Bûyerên naveroka çirokê. Di vê kêferatêde çiroknîvis şîya ye «Redwan» dûri «Mircan» bike Çawbe? Mircan di jîyanê de çawa be,ne xeme.

Lê di çirokê de bûye Nimûn,û ta ku bibe kesekî wêjeyî gereke bi serbestî, bêyi alîkarîya nivîskar,sobahî yê di derya çirokêdebike. Dîse di gel vêgas hostayî yê di nîvisina çirokê de çend têbînî xwe didine pêş. Belkî em bikari bin hin kêmâsi yên huneri ber bi çav bikin:

1 - Di filaş bakan de,gelekî zû nivîskar derbasî jiyana dîroki ya Mircan bû ye. Bi awaki beloq û zuwa pesnê qehremanê xwe dide. Belkî xwe carna ji bîr dike û bi mirvan re di wan kêli kan de di be yek! Digel ku pesnê mircan tu huneri yê û pêşketinê di dawî yê de ji çirokê re ne hênit. Ango Redwanê nivîskar çiqasî pesnê Mircanê

penaber bide tu tiştî nû li avahî ya çirokê zêde nabe û çirok xutir jî nabe.

2 - Evin û dildarı di çirokê de dibe lasdarî! dibe têkilîyêna laşane di nav bera mirvan û jîneke Feransî de ev bixwe li europa ne tiştîkî xerîbe lê hewqasî mircan bala keçkan lîwi warî bi kîşîne ta bibe «mère mîrek» dinav jînêne europa de tiştîkî na hênit bîra mirov ji bili nexweşîya Rojhilatî yê û careke dî dozêne evînê û dildarı yê ne rast dibîne Nivîskar dîse dimîne bê tirs di rûtkirina wê keçika firansî de tazi kirina wê di çirokê de Ew rûtkirin dibe gavek dirêya serbest kirin û serberdana çiroka kurdfî ji şerezarî û fihêtîyê.

3 - Mircan xor текî qure ye,paye ye,tu kes,tu tişt, çavê wî danagirin: «yên li ber çavan dîse Artixil û Emin bûn lê wan jî çavê wîdanedîgir» tin P 38.

Careke dî di beşê (VI) de ji çirokê Mircan gelekî tê pivdan û beloqkirin ta wek şoreşgêrekî tê xuyakirin û hîn ew zaroke ev bi xwe nabe kêmâsi ji çirokê re lê şasîti di wir de ye gava nivîskar bi xwaze Mircan bide xuyakirin ku (şoresgêr û qure) ye jî,û ya xirab tir ewe,ku sihika Mircan xwe berde ser wêna nivîskar û herdû wêne tevlîhev bibin.

4 - Mircan,digel ku deh salan li europa jî ye,û bûye Diktor lê dîse maye gundi,jî gundiştîya xwe ya bejik xilas nebû ye,tim dibin Bandûra Diktrorî ya xwe de dijî,xwe nabîne mirovekî sirûştî, mafê penaberî yê dixwaze. Herdem Dr.dibîne ku nîşanek li ser milê wî pêdibî ye xiik hemî wê nîşana mezin bi bînin. Heya dawî yê dîn dibe wek dînan lêtêt di bin agehê vê xwendevanî û ritbê,de.

Nivîskar dikare xwe dûrî gelek kelem û davkan bike. Ne gerek bû hevqasî çiroka xwe bar bike bi dîrokê bi hêviyên netewî. nivîskar ji ber vê yekê pişta mircan çavand di bin barê hêviyên xortekî kurdê ji welat dûr ketî. û da bi bar rabe pivda qurekir mîrkir tu nemabû bibe pêxem-berek!

Di risteçiroka R.Eli de filaş bak birengekî giştî pirin. Ji vegerandinê bûyeran tê fêyde kirin ku doza welat li biyanîyê li ewrpa bête bîra wan. Warê devrêن kurdî tevlî jiyana parîzê û moskoyê dibe çirok bi van bîrhatin û bîranînê zaroktî yê li Amûdê, li Qamişlo, digel ku hinek ji hunerî ya wê dadikeve lê geleki naveroka wê têr û zengin di be.

Bi rastî di çirok R.Ali de gelek quncik hene ji bo lêkalînê û nivîsandin û rexna. Lê berî hertiştî di mînin çirokin kurdî bi zimanê xwe yê nerim, bi kësim û forim û naveroka xwe. Xasime çiroka «Resûl» ya ku bi hunerî yek bi lind hatîye danîn. Têde jiyana xortekî kurd ku melatî yê li gun-dekî ji derveren kurdî li sûriye dike. Çirok tiji jiyane tiji kurdîtîye.

Nûçeyek

Piştî kar û xebateke giran û ber-dewam ji destpêka sala 1993 ve, li Moskoyê ji adarê de NAVENDA LÊKOLÎNÊN KURDÎ hate damezrandin

Kadirêن (serkarê) vê navendê dîroknas zimannas û kurdnasên bilindin. Hêviyên wan di pêş-

Çiroka «Seyro» wênek hûre ji civaka kurdî re kişandî ye, bi taybetî jiyana kale mîrekî û pîre jinekê ji bajarokê Amûdê. Di nav vê wênekêşiyêre hinekî çêri doza pîrekê bûye, bêyi ku xwe daxe pêpelûka jêr, ya nêrînê mibaşir û rast bi rast di warêن raman û felsefê de. Di bûyerê çiroka «Seyro» de dilsozî û dilbêşîya jina kurd daye xuya kirin, li hem ber dil tarîtiya zila-man, mirov, û dostêن mîrê Seyro.

Li dawî yê, mirov dikare bibêje kubihna kurdîtîyê ji van çirokan di bare. Netenê ji ber bûyeran û kesê wan, lê belê ji ber ku ev çirok ji axa kurdî derketine û li ser mezintirin doza wê digerin. Doza heyîna gelê kurd. Ya ku perên xwe bigiranî berdane ser her çar alî yêن çirokan, Bûyeran û peyvan.

* Tilûrê Bêgane. Redwanê Ali çirok .weşanên welat. stockholm 1991. 110 rûper.

vebirina van besên kurdelogiyê de hêjane. Lê belê gaziya wan ji miletperwerên kurd, û dostêن vî miletî alîkariye.

Em bi navê mivîskar , xwenden-ven, û dostêن kovara «Pirs» ê kêfxweşî û dilşadiya xwe , bi pêkanîna vê navendê diyar dikin, û wê ji dil û can pîroz dikin, wilo jî amadekarê hemî rengên alîkariyê ne.

•• Pirs ••

Romana yênen perişan

Ismail Dêrsimî

Dibêjin, çîrok hizira gele û neynika şehrîvaniya wî ye. Bê guman ev gotin past û duriste, û tu dûman li ser tune ye, ji ber çîrok bi karmendiya guheztin û tomar kirina rêzik û şewê jiyana gelan rabû ye. Lewra bû ya alîkarêd nivîsandina dîrokê, û roleke mezin di vê rewşê de girtiye, tu carî nayê inkar kirin.

Dema ev tişt tête gotin, romana «yênen perişan» ya wêjevanê kurd yê xweşnas. Azad bavê şîhîn, tête bîra mirov, çîmkî ev roman bi heyber û mijêda xwe, bi rola tomarkirina bûyerên şoreşa Êlûnê li kurdistana Iraqê rabûye, ji destpêkirinê, ta bi rawestandina wê, û tîrêjêن ronahiyê davêje ser ravêja perişaniyê, di gel hemî êş û şkencê ku miletê kurd tê de hatiye vebuhijtin di dirûmê berdewamiya êrîşen nejdevanê bi qirêj, yênen rîjîma leşkerî faşist li bexdadê.

«Yênen perişan» wênakî zelale li ser rewşa pêdariyê û berxwedanê, ya ku herdem miletê kurd bi bawerî tê de dijiya, û jî alîkî din ve sedmîn jîrkevtina car bi car û bi taybeti, jîrkevtina şoreşa Êlûnê şirov dike, û hemî şâsiyên ku lê hatibûn pêçan û bûne sersedema weşandina hêviyên rêzgariyê, tevlî gorîyên mezin, yênen ku hatine pêşkêşkirin wekî ardû ji vê şoreşê re.

Ciwan kesê herî giring û pêwîst, di vê romanê de, xwendin û manda jiyanâ xwe, û bi serde evîna niştiman, û paşê xwîna xwe, dikir gorî, bi hêviya ku di demêن pêşde miletê kurd serfiraz û azad bijî. Lê mixabin ew hêvi tev, ber ba dibin, û hogir û xwedî û miletê wî carek din dikevin pêvajoka karwenenê perişaniyê, û kovaniyê û pencerên Omîdê wekî gelek caran têne girtin, û konê taristan û hejariyê xwe berdide ser hemî kolan û deş û çiyayêñ kurdistanê.

Bi kurtî, yênen perişan, wênakî biçûke ji serpê hatiyek mezin re ye, ji ber lepêñ hov û mivane? nasiya ku li hemî deverêñ welat hatiye hêvisandin?

Di gel van tiştan de romana, yênen perişan, xwe dide pêş wekî bizav û kefteleftek serkevtiye di rîya dirêj û zehmet ya, damezrandin û hîmedar-kirina romana kurdî nûjen bi şewekî hunerî nû û zû dikarim bê dudîlî bêjîm, ku, yênen perişan, bizavek bi talante, û berhemeye yekemîn û bê hevtaye, di rewşa kêmînivîsandin, û derhatina romana kurdî nûjen. Û bawerim ku di hêla avakirina hunerî de, ne kêmîtî romana, çiya û çek, ya wêjevanêenglîzî cîms oldert, ya ku li ser pirsek kurdî wek ya, yênen perişan, hafîye nivîsan-

YÊN PERÎŞAN

ROMAN



din. ji ber wilo, ez bawerim ku, yén perişan, di demêñ pêşde, wê bibe şopek di rêça tujandina armanca raderkirina romana kurdî nûjen, û pêşketina vî celebê wêjeyî.

Bûyerên wê bi rengekî yekcûr û tevcivan hatine ristin û hunandin, û bi zimanekî xweş û zelal, gultegoyen wê hatine avakirin. Xweş xuya dike, ku zimanê kurdî bi hêze, û kare bi hemî celebêñ toreyî re bê vebuhijtin, nexasim di vê dema ku giringiya nivisan-dinê bi zimanê dê dide pêş li himber bizava tunekirina vî zimanî, ji hêla hêzên şovenist yén dewletêñ zordest li her çar parçen kurdistanê.

Lê çend têbînêñ hunerî, di warê avakirina vê romanê hene, giringe bêne gotin, ji ber hinek

ziyan gihandiye wê:

1. Di çend rûpelên pêşî de, bûyerên romanê bi rengekî mîkanîkî hatine dafdan, û girêdana xwendevan bi berdewamiya bûyeran qels dike.


2. Guftegoyen siyasi, yén ku kesên romanê dikin, ne li gor temenê wane. Ev ramanêñ kesitiya danerin, ku li ser zimanê kesên romanê derbas bûne naveroka wê. Loma zirar gihaye guftegoyan bi xwe, û wilo ji gihaye deriyêñ ku romanê bi hev girêdidin, û rewşa ku ew kes tê de dijin.

Tevî vî tiştî, dîsa ez dibêjin ku romana, yén pevişan, bi destê hunermendekî şareza hatiye nivisandin û ev têbîn ji nirxdariya wê tucar kêm nake.

Ji Ferhenga Kurd-daxê

çéfoké bilayen me gëx
eu bilawéne aye bilayen me gëx aye
é min ti defiké gëx milé à ti xigé
la bi gëx à ti hez la my gundun bëga
ti bi defiké à ti ve midellé bëganté
ji se bëxé à ya midellé bi tisténe
eté ake këtak ti wëde fëx bi defiké chéman
et a bi fëxé a bi tute a que jet à këtak me
tute bi wëde gëx a bi defiké
mëndé a bi wëde gëx miñ bilayen me gëx
x am siñ komadé lez a siñ medé
mëndé à siñ mine am siñ medé nëde wa a
li ux wa a sallemé eze a dijimé bilayen
li a këtak këtak li fëxé to gien wëde li
wëde nindimé bëga à dijimé xi à zët
këtak këtak li fëxé
li këtak li fëxé a bi wëde gëx
li mëndé komadé bëza dñi à të de wëdë
vëtli et fëxé a to wa gëx gëzane li ja ron
gundun komadé li fëxé wa këtak à të
nëde li këtak bëza li këtak mëndé a
këtak li këtak à të pëfet li këtak gëx
li këtak à të de këtak xëbi désté li ger
de këtak xi à cù de këtak xi à këtak
de bëganté bëla wëdë li këtak wëdë

- 1 -
Kalê
Safiya
- 1920 -
1977



• Rêber Robari •

Dar û ber, kanî, çem, gir, newal, çûkên qeşeng, darêن zeytûnê, stêrkên xwîn şîrîn, awaza sûlava Meydankê, biharêن bîndar, keskesoreke xemlandî bi rengê ala xwe avakir. Efrîna xemxwar, bûka «kurdaxê» va kembera keskesorî li bejna xwe zirav aniye, û serê dîlanê li ber awaza hesta xwe li ber ahenga bilbilên Sersingê, li ber stiranên çûkên Serê kaniyê, li ber bilûra şivanên xemgîn bi sermestî dikşîne.

Vêca gelo!

Bûka me dîbe dilbera kê,û nekê?!

Eyan dilêñ xortan tenê têxist, lê yên kalemêrên
me jî vê ra?!

Kalemêrê me, «kalê satiya», wek ciwanekî, dibe xemxwar, dibe evîndar, kovan û axînan li hember dîdema dilbera xwe bedew dikşîne dilê wê wek hevalén xwe mirov per-wer niş-timan-parêz Cegerxwîn, Goran, Hejar, Hêmin, dibe pêt, li ber alafê wê nîn ji belengazan ra dibrêje, bi stêrên

çavêن xwe kincen sêwiyan dişo, bi peyv û axiftî-nêz nazik bawesinêner nermik avadike û di derî û pencerên bêzara re derbazdike, gul û sisinê perisanan pê vedijîne.

Kalemêrê me Mihemed Eli Ebdo ye, di sala
1920 an de li kurdaxê gundê satiya ji dayika xwe
bûye.

Mihemedê ciwan ne xwende bû, rîcbereki jîr
û jêhatî bû, di dibistan û xwendeha jînê de hîn
bibû.

Di destpêka temenê xwe de, bi mirûdan re dida
û distand, û dibe xwedîyê baweriyeke olperest lê
vêkê linik wî pir dirêj nekir rewşa civakê ya ras-
teyeqînî, çawên, wî ta dawiyê vekirin, hesta nav-
netewiyê û welatparêziyê di xwîna wî de di ser-
binî hev re pêl didan, wî pêkanîna armacên xwe
di rîya partî komonîst re dît, lew re dibe
endamê vê partiyê, kalê me gelek sal di nav rîzên
wê de bi xebateke çalak qedand. Ew bê westan-

din li dijî çewsandina mirov ji mirov re, li dijî setemkariyê netewa serdest li netewa bindest, bi tundî rawestiya, û têkoşîna xwe bidilsotî ajot. Di sala 1961 - 1962 an, di zîndanê kevnisperstan de xewkir, piştî ew azad bû, şopa têkoşînê berneda û pîdarî of rêya xwe de çû, lê seyda Mihemed Eli Ebdo bi biryarê partî hat sarkirin, di pişt re wî bi vîna xwe dev jê berda.

Gava ji pîreka wî hat pirskirin, ma gelo tewanê wî çibû? çîma parti ew sarkir? Bersiva pîreka wî ev bû: «Bavê zarêñ min berketiyê welat û gelê xwe bû, ew ne tenê peyakî navnetewî bû, lê hîn wek mirovekî gelparêz jî hat naskirin wî dixwast bi zimanê dê binivisan da, ew ji ber mafê mirov de bibû kesek dîlawer. Ev bû gunehê kalê min.

Mihemed Eli Ebdo di baweriya me de pir sûdênerxbiha ji kaniya jînê wergirtine û dîbe mamostekî şehreza, şîretên hişmendî li neweyên dohatî dike. Em kanin bi hev re hin nimûnan ji defterên wî, yên ta niha neçapkirî, bixwînin gunehê pêz li stuyê şîvîne gunehê millet li stûyê pêşengên mîlete. Eger çawa mirov dixebite ji bo karê, zirar. jî li kêleka karê ye, û gelî birano kar jî di vê rêkê de heye, û zirar jî tê de heye kar di rêka zanînê da ye, û zirar jî di rêka nezaniyê da ye».

Seyda Mihemed Eli Ebdo li ser pir mijarên civakî, rêzanî sekiniye, niha çar defterên biçük û yeke mezin ji berhemên wî di destêne me de hene ew tê de li ser «çiroka mîletê kurd» çiroka birayêne me şêx «Axîna welêt» zêneba osmên

«Êma hemo» û h.-d.bi zelalî dinivisîne.

M. Eli wek pisikolocekî dikeve cîhana hundirê mirov, ne tenê tê de qenciyâ dibîne, lê hin aliyênen nêgâtîv ji dibîne, û wan berçav dike, «Mirovê ji xwe hezdike, û xwe ecibandi serjinikî, û bi tena xwe rûdine, û nefş mezîn, û xwe bi pêçîyan, û di bin xwedê re dibîne. Mera bi dirêjahiya melyonek kîlo mitir ji vî dûr keve».

Her weha jî mamostê pêşverû, bi awakî felsefi li rex jinan radiweste, û rexnan li mîrên paşketî digre «Bila mîr herin xwe ji komela jinan pîrskin heger kî çiye û kî ne çiye».

Bi ser van waneyan دروس de ji, seyda gelel helbesten rêzanî nivisîne, em di vir de bireki biçük pêşkeşdikin:

«Lênenê mezîn, Lênenê mezîn!

Miletên biçük ber te dibezin.

Hewna zanîn hew ci dixwazîn».

û di helbesteke dîtir de jî dibêje:

«Kanî tarîx û şêxê xanî?!

Ji wê komê mabûn kurê Berzanî

Ji Îraqê de fikir bi cihanî

Berzanî heq bir bi navê welatanî

Bila xwaşbin birêne sadqanî».

Bi rastî em çiqas li ser seyda M. Eli û berhemên wî di vir de binivisinin her tim kêm û kurte, mebesta me ji vê gotara biçük pênasînek bi kalemîrê me ra bû, em hêvidîkin di rojêne pêşende de, lêkolînen hêja û fireh li ser nîvisarêne M. Eli Ebdo bibin, û koşeyek tarî ji ezmanê çanda gelê me bête ronahîkirin.



Sirûdêن Sermok

Bi
Awirêن te
Ez jiyanê
Li hev badidim ***

Bi
Girnijîna lêvên te
Paytexta derdan
Sirûdêن xwe di hejmêre ***

Şermîniya
Li ser dêmêن qurmizi
Qelaçêن evînê di terikîne ***

Peyvên tazî
Bablîsokêن payizi
Ji zarê min di revînin ***

Ramîsana
Gujmikêن te
Dilê zîvar zozanî dike ***

Bi
Segurka sibê re
Hêvî diçin gemyana ***

• Bextres • O

Sê ramûsan

◦◦ Hoşeng ◦◦

*Di kûrika xweyî qedexa kirî
de
Ez geriyam...
Sê ramîsan bi dest min
Hatin...
Yek ji wana
Min şiyand
Ji xurstêre...
Û yek ji agir re..
Û ya dawî...
Ji wêre...
Ji dergûşa xwere
Ya ku pircaran
Ez razandim
Li ser xewnên xweş
Nuxumandim
Bi sítava çavêd xwe..
Mijankên xwe...
Û...
Ji tinebûnê
Pa... ras... tim.*

3.5.1993

Stranek

◦◦ Awazê Kalo ◦◦

*Dilê min ne gode ye
Û çavên te
Du gupik hunguvîne
Li ser kena-ra evînê.
Dê veke kezeba xwe
Li pêş hulma min.
Da em bibin
Girkek biçûk
Ji hevîrê nimêjên evîndaran
Li her civînê.
Da em bibin
Rûpeleke revyayî
Ji ber devê pênûsê kînê.
Evîna te,
berbiska wenate
awaza gavên min
dixemlînê.
Dê veke Dê...
Da ez simêlên dema xwe
Kurkim.
Besê mine
Mêraniya ku di kenê tede
Xwe dibîne!!.*

DÊWÊN RÛRES

- 1 -


Di guhêñ birînêñ min de ,
Peyvên tehl û tûj avjeniyê dikin .
Neynûkêñ janan ,
Goştê xewa min dixwin .
Lêvên xeman ,
Xwîna şadiyêñ min dimijin .
Diranêñ şîn û kovanan ,
Lingêñ rehêñ min gez dikin .
Ü leşkerêñ Ehrîmanan ,
Xewnêñ min dorpêç dikin .

- 2 -

Îro jî dêwêñ rûres ,
Pêxemberêñ wêranê ,
lehangêñ pişan ,
Êriştitirêñ giyanê min dikin .
Yek dixwaze ,
Rê lê bigre .
Yêñ din dixwazin ,
Wan bizingirînin .
Hemî dixwazin ,
Xwedêyê xwe ;
[Tariyê]
Jê biparêzin...

- 3 -

Nêçîrvanêñ dil-ker û kor ,
Dehfêñ dek û pilanêñ xwe ,
Li ber nêrînêñ dilê min vedidin .
Tîrêñ kînêñ xwe ,
Davêjin ramûsanêñ min .
Agirê ramanêñ xwe ,
Berdidin stranêñ min .



Dixwazin kenê çavêñ min ,
Bişewitînin...

- 4 -

Zengilêñ tirsê ,
Di sîngêñ xewnepestan de har bûne ,
Bê vehes lêdikevin .
Wan dilerizînin .
Wan dicivînin .
Di sergoyê demê de ,
Wan digevizînin...

- 5 -

Dîsa...
Erê dîsa...
Evîndarêñ vemrandina navê min ,
Bibihna sorgula min de direyin .
Xwe dajon siha dengê min .
Şerê zimanê hêviyêñ min dikin .
Dixwazin bayê evîna min
Serjêkin...
Nizanim,çima ,
Ev hestêñ min şiyar nabin .
Ü nimra solêñ tawanêñ wan
Riswanakin?!...

RÛXWEŞE ZİVAR

16.2.1993

Ji rewani Palo re

• Nûhat •

Dûr birin pêlê xwe pişt deryayê lavan pêlê şînê
Dem û çaxim bûne hemrah.. pirsiyar bûn ew ji jînê
Ka ci bû îro li vê qadê li ser taca zemînê?
Lê bi awazek siya reng hat me bersiv ji erînê:
Bûye çaxê ku peyabin xwîn û şehbazê evînê
Ew ji pişta neqşikê mîrzo biwejana birînê

Şev bela bû kirya tarî ew li şar û hereman
Şewq û tîrêja royê hatî veşartin ji xeman
Deng û awaz lal dibûn ew bi dûsed dav û geman
Rund û fermîsk bûne volkan dapekîn çok û çeman
Rist û bixşad û pirûz nadin tucar mafê deman
Ger peyabin wek te palo j'hespê xam û qeleman

Ew li orta jan û derdan guleke j'Qehwan û lala
Bîn û mawerd veweşandî Şewq û ronî dane bala
j pîng û astegan dida me bêyî pêdav û mitala
Dengekî şerîn û ra wan ji xunav û berf û jala
Doz û dexwaz jîn û jîndarî ji bo kurd û hevala
Lê mixabin ne bela bû ma li mîvazeke vala!!

Bê çilo av.. vedikî şopê li çem û gelîyan
Bê çilo xwîn tête nîşandan li rûkê xwînîyan
Bê çelo berx.. têne berdan têne ber mak û diyan
Bê çilo bed deng.. dibî awazke zîz û didî çol û çiyan..
Dê bimînin tû û çend kes ew bi navê te li qûnax û ciyan
Sinceq û sernam û al bin.. sedema hest û viyan.

«Kî» û «Kê» çine?! û çawan têne xebitandin?!

Ev her dû bêje (kî, kê) di zimanê kurdî de bi dû cûreyan têne xebitandin:

1 - Bernavêñ pirsiyarı.

wekî: Kî ji bajêr hat?

- Kê name nivîsi?

2 - Bernavêñ nependî (nebinavkirî).

wekê: - Kî bi Kê re diçê, bila biçe .

- Kê, Kî bi xwe re bir,bila bibe .

Ev her kû navdêr jî,cihê navdêrên merovan digrin.Ango,ji dêvla merovan têne xebitandin .

Di bingeha (Kî, Kê) de,şanekek min heye.Dix-wazim bibêjim,koka evan her dû bernavan yeke.

Di raweya verêsê de,«Kî» dibe «Kê»

wekî: - Kî hat?

- Zîn hat.

- Kê name nivîsi?

- Zînê name nivîsi.

Ji nav rêzimanzanêñ me ,Qenatê Kurdo tenê, çêl evê şanekê kiriye.

Celadet Bedirxan,Kamîran Bedirxan û Reşîdê kurd,her sê jî dibînin ku her dû bernavêñ babeta me (Kî, Kê) serbixwe ne.Ango,her yek jî wan bernavekî serbixwe ye .

Her dû bernav yek bin,yan jî her yek ji wan bernavekî serbixwe be,ne xeme .Tenê dixwazim bibêjim gelek nivîskar di nivîsîna evan bernavan,

de şas dibin.Her bernavek ji evan bernavan (Kî, Kê),cihinî taybetî di raweyêñ hevokan de hene pêwîst ku em ewan cihan nişan bikin,da em biza-nin ewan bernavan çawan binivîsin.

«Kî»

Ev bernav di evan cihan de tête xebitandin:

a - Heger (Kî) kirarê (kirde, pişkar) ê lêkera saltgîr (neger guhêz, netîper) be,di evan çax û raweyan de:

1 - Hemû raweyêñ buhêrkê:

wekî:

a - Kî çû bajêr?

- Zîn çû bajêr.

b - Kî çûye bajêr?

- Zîn çûye bajêr.

c - Kî diçû bajêr?

- Zîn diçû bajêr.

ç - Kî çûbû bajêr?

- Zîn çûbû bajêr.

2 - Nuho:

p- Kî diçê bajêr?

- Şîrîn diçê bajêr

3 - Paşeroj (Mand):

- Kî yê (dê) biçe bajêr?

- Şîrîn ê (dê) biçe bajêr.

b - Heger (Kî) kirarê lêkera derhingêv (ger-guhêz, tîper) be,di evan çax û raweyan de:

1 - Nuho:

- Kî Govarêñ kurdi dixwîne?

- Zîn Govarêñ kurdi dixwîne

2 - Paşeroj (Mand):

- Kî yê (dê) ferhengê bikire?
- Zin ê (dê) Ferheng ê bikire.
- c - Heger bireserê (pişkberê) durist be, di evan çax û raweyan de:

1 - Hemû raweyên buhêrkê:

weki: - Te kî xelat kir?

- Min şîrîn xelat kir.
- Te kî xelat kiriye?
- Min şîrîn xelat kiriye.
- Te kî xelat kiri bû?
- Min şîrîn xelat kiribû.
- Te kî xelat dikir?
- Min şîrîn xelat dikir.

Ç - Di hemû hevokên navdar de:

weki: - Ev kî ye?

- Ev şîrîn e.
- Tu kî yi?
- Ez xorşid im.
- Kî ne ev merov?
- Ev merov xizmîn me ne .

Diyareku (kî), di hemû hevokên navdar de salix (xeber) têt, ci ew salix pêşxistî be, ci paşxistî be.

«Kê»:

Ev bernav jî, di evan cihan de tête xebitandin:

a - Heger kirarê lêkera derhingêv be, di hemû raweyên buhêrkê de.

weki: - Kê av rijand?

- Zînê av rijand.
- Kê av rijandiye?
- Zînê av rijandiye.
- Kê av dirijand?
- Zînê av dirijand .
- Kê av rijandibû?

Zînê av rijandibû .

b - Heger bireserê durist be, di çax û raweyên:

1 - Nuho de:

weki: - Zîn kê dibîne?

- Zîn şîrînê dibîne.

2 - paşeroj de:

weki: - Xorşid ê (dê) kê bixwaze?

- Xorşid ê (dê) zinê bixwaze.

C - Heger bireserê ne durist (ne rasteder) be:

weki: - Te ji kê pirsî?

- Min ji şîrînê pirsî .

- Şîrîn ê (dê) bi kê re biçe?

- Şîrîn ê (dê) bi zînê re biçe.

Ç - Heger bireserê nêv (nav) be:

weki: - Bizina kê dar şikand?

- Bizina fatê dar şikand .

- Ev rasteka kê ye?

- Ev rasteka zînê ye.

Ev bûn cihênu her bernavek, ji bernavêne babeta me di wan de têne xebitandin. Ci ew bernav pirsayarî bin, u ci ji Nependî bin.

Nimûneyine kiryarî:

1 - (Kî ji kê re ci bibêje bila bibêje).

Kî: bernavekî ne pendî ye, kirarê lêkera (bibêje) ye .

Kê: bernavekî nependî ye bireserê ne duriste

2 - (Kê ci da kê, ne xeme).

Kê: bernavekî nependîye kirarê lêkera (da) ye .

Kê: bernavekî ne pendî ye, bireserê neduriste, çunki wateya hevokê eve:

(Kê ci da (bo) kê).

3 - (Te kî, li mala kê dît?)

Kî bernavekî pirsayarî ye, bireserê lêkera (dît)e .

Kê: bernavekî pirsayarî ye, bireserê navê (mala) ye.

Ronîkirineke Zimanevanî

Li ser çend Pêşgirên kar:

(Ve, we, ewe, ra, da, hil, hel, wer)

Beşê diduwan

• Berzo •

(Berî kü ez dest bi vî besî bikim dixwazim xwendevanan agedar bikim ku beşê yekê yê vê lêkolîna han di jimara (2) ya vê gavarê (pirs) hatibû belavkirin lê mixabin gelek şaşiyên çapê têde diyar bûn û wan şaşiyen hin car ziyankariyek digihande naveroka gotarê bo nimûne peyva li rex affîx rûpelê 24 gatiye çapkîrin Lê rast gereke hatibane nivîsandin.

Herweha di rûpelê 28 - an de wateya ye-hêlan^ı hatiye, ev jî şase, gerk hatibane çapkîrin. Di rûpelê 25 an de rêzika çaran peyva dawî (morfêm) hatiye, ev jî şase gereke (fonêm) hatibane).

Di pazegrafên bûrî de axaftin liser pêşgira (ve) bû, ya ku hinek nêzîkî di rengê xwe li morfemeke dîtir dike ku ew jî (vê) ye. Di bawerîya min de hîç pêwendî navbera (ve) û (vê) de nîne. Nimûneyên zimanê kurdî didê xuyanî kirin ku di hin zarêz zimanê kurdî de pêguhartinek navbera du dengê ziman de çêbûye; ango dengê (v) cihê (b) û (p) di hin peyvan de digire, ku (v) ya kurmancî bûye (w) di soranî de, wek:

1 - bêje-vêje-wêje

2 - bi agir xistin

bi wê/ wî xistin=pêxistin=vêxisytin=wêxistin

3 - pêketin-vêketin-wêketin

Pêşgira (ra):

EV pêşgir berê bizava kar berew asoyî de dibê, lê gelek caran jî berew alîyên dîtir ve dibe, yan jî mebestek û wateyek nû didê. Hin caran (ra) mêzîka wateya (along) ya Inglîziye nimûne jî evin:

kurdî

ra+kar

ragirtin

radan

rageyandin

rahatin

rahêlan

raperîn

rakêşan

rawestan

raxistin

raman

rahiştin

Inglîzi

hold back delay

dzive away

ingorm

become accustomed/familiar

train, tame

jump up

pull along

stand still

spread

ponder, meditate, pause for

thought (فکر، تکهور)

hold, carry

Têbînî:

I - Ji van mimûneyên jorî karêن (radan, raxistin, rakêşan) bizava kar berew asoyî de didê xuyanîkirin, lêbelê karêن wek(rabûn, rakirin, rahiştin) bizava kar berew jor de dibê.

II - Divê nivîskarêن kurd navbera du celeb (ra) nasbikin:

1 - (ra) weku pêşgir

2 - (ra) weku parçekî bincî ji laşê peyvê, nemaze kar be, yan,beşên dîtir be. lewre (ra) di peyvên wek (razan, ramûsan, rade) de nakevê bin destûra pêşgirbûnê de weku (ra) ya (raxistin, ragirtin, û...) ji ber vê yekê çenabê ez bêjim yan binivîsim: (ez radizim) (ra+di+zim) ya rast (di) ya demê niha (simple present) di despêka kar de bête nivîsandin wek:

ez dirazim

ez diramûsim

Herweha çenabê em bêjin (ramûsan) ji (ra) û (mûsan) pêkhatiye, yan (razan) ji (ra) û (zan) pêlehatiye. Di zanîna ziman de (ra) ya (ramûsan û razan û rade) weku movikek (sylable) ji laşê morfêne tê ji martin ango ev (ra) ne morfene

III - Di zarê soranî de peyva (rakirdin) heye ku wateya (lezkirin) û (bi xar kirdin) didê zimanzanên zarê soranî weha dibînin ku (ra) ya (rakirdin) ne heman (ra) ya raxistine. Sedema vê yekê jî ewe ku (ra) ya (rakirdin)ji peyva (hera) hatiya kurtkirin,ku ev jî wateya (xar biley) didê. Bi rastî peyva (xar) di zarê kurmancî de li nik hin hozan baş peydadibê û dibêjin:

- bi xar were=bilez were. Herweha peyva (hera) ya zarê soranî gelek nêzîki (hurry) ya zimnê inglîzîye ku heman wate didê.

IV - Di despêka beşê yekê de me got ev ton pêşgir bi karan re têñ û wateyên nû didin. Lê hindek peyv dervî xeleka kar hene ku (ra) û (ve) di wan de peyda dibê, ew jî evin:

raser

raber

rajor

rajêr

veder

Dî bawerîya min de, hatina (ve) û (ra) bi van ton peyvan re drust bûye, jiber yek xalê ku peywendîyeke hevbeş wan digihêne hev, ku ew jî wateya zerfî di herdûwan de heye (adverbal meaning).

Pêşgira (da):

Ev pêşgir bizava kar berew xwarê de dikê, herweha ev pêşgir nêzîki di hevalkarê (down) a Inglîzî dikê.

kurdî

da+kar

dabarîn

dabirîn

dadan

Inglîzî

rain down

cut down (cuda kirin)

close down

dagirtin	take down (overcome)
dageran	descend, climb down
dahatin	come down
da ketin	fall down
danan	put down, lay down
danistin	sit down, scuttle down
rûniştin	

Têbînî :

I - Çawe ku (da) wateya karê sade diguherênê, wusa jî ew peyva nû
hatiye dariştin carne çend wateyên têvel didê wek:

1 - Min qelema xwe di destê wî de girt

2 - Min çuwalê xwe yê vala dagirt

3 - Azad ji min hatiye dagirtin (ji min xeyidîye)

II - Dervî warê pêşgirbûnê, (da) heye weku morfêmekî serbixwe û
watedar ku peyveke ferhengî drust didê, li nav du besên axaftinê
dewra xwe dibînê, herweha çend wateyên corbecor didê wek.

- Daya min ne li male, (da) yan jî

- diya min çûye bajêr (dê)

- daya min nan da zarokan (da)

- Bavê min li min da (da)

III - Carne di zarê soranî de (rû) yan jî (ro) weku pêşgir cihê (da) bi
heman wate digire wek:

ronan/ rûnan (soranî)=dânîn/ danan (kurmancî)

rûnişrin (kurmancî)=daniştin (soranî)

rûkirin (kurmancî)=dakirin (soranî)

Pêşgira (ro) di soranî de, û (rû) di kurmancî de, yek wate distênin.

Hêjayî gotiney ku li deverên wek Rewandûz û kwêscinq û hewlêre
pêşgira (rû) li şûna (ro) ya deverên dîtir bikar tê. Lewre ez dibînim
ya baş ku pêşgira (rû) weku şêweyek edebî di warê mivîsinê de bikar
werê ango: Li şûna

(ronan), (rûnan) werê, û li şûna

(roniştin), (rûniştin) werê, herweha ji dêvla

(ronan) yan (rûnan), danan yan danîn, bikar werê, ji ber ku pêşgira (da) di herdû zaran di cihekî berferetir girtîye.

Jibilî wîlo jî, peyva (rû) bi wateya (dêm) û hin wateyên dîtir di herdu zaran de heye û eva han jî weku peyvek serbixwe bikar tê, ku hîç pêwendî bi pêşgira (rû) ve nîne.

Pêşgira hil/hel:

I - (hil) û (hel) yek pêşgirin, cudawazîyeke zargoyî di nav herduwan de heye, ku kurmanc dibêjin (hil), belê soran (hel);ango yek bi (i) û; yê din bi (e). Eva han jî hîç guhartinê marfolocî yan jî wateyî dirûst nakê.

Ev pêşgir bi kar re tê bi mebesta bilindkirina bizava kar ber bi jor ve, ji bilî wilo jî hindek wateyên dîtir jî diyar dikê.

Hêjayî gotinê ye jî ku pêşgira (hil/ hel) bi wateya (bilindkirin) nêzîkayî li hevalkar ekî Inglîzî dikê ku ew jî (up) jêre dibêjin herweh (up) di Inglîzî de weku peyv bikar tê, lê biser wilo de jî nikarê bi tena xwe wateyekî serbixwe bidê, lewre ew jî li gel kar tê û gelek caran wateya bilindkirina bizava kar didê mimûneyên hil/ hel:

kurdî

hilavêjtin
hilwasîn
hilat=hilhatin
hilat-hilhatin

hilperîn
helaxinîn
helbestin
hilgavtin
hilgirtin
hilpekandin
hilkêşan

Inglîzî

hang up, throw up
hang up, throw up
bring up, bring to lihght
(nûdiyarkirina sojê û
heyrê û stêrikan)
(sema kirin, xwehildan)dance
block up
tie up, up up
lift up
lift up, carry
jump up
draw up

helsan	get up, stand up
hildan	throw up
hilçinîn	pile up, pike up
hilkirin	pull up

II - Wateyêن dîtir:

Jibili wateya bilindkirina bîzanva kar (hil/ hel), hindek wate dervî vê yeka han pêktîne wek: helawardin (soranî)-ji hev cudkirin

helbestin	=	hûnandin û danîna helbestan
hilpesartin	=	paldana tiştekî bi tiştekî dî ve
hilbijartın	=	neqandin
hilqetandin	=	dadirandin
hilçenî	=	lerz ketin ji tirsa
hilpêçan	=	[bandage, wind up (Ing)]
hilweşan	=	ji hev ketin,
helkewt	=	sudfe (chance:ing)

III - Bekaranîna (hil/ hel) di zimanê Farisî de gelek kême bu nimune:

kurdî	Farisî
helpisêraw (soranî)	helpisaw
helriştin/ hilrijtîn	helrijan
helbeste (soranî)	helbeste

IV - Hinek peyv di kurdî hene, ku bi (hel/hil) dest pê dike, lêbelê hîç pêwendî navbera van peyvan û pêsgira (hil/hel) de nîne, û eger hin ji wan hebê jî eva han pêwistî bi lêkolîneke dîrokî heye, hêjayî gotinêye ku (korî zany arî kurd) ev xala han xweşik ronîkiriye û

çend nimûne bo vê yekê anîne: (helim/ hilim, hele, helpe, heliz) ku (hel/hil) beşekî bincîye di van peyran de.

Pêşgira (wer):

Ev pêşgir weku yên dîtir (ve, ra, hil) jimareke ber fere ji karan nadê ber xwe, herweha hin caran bi alîkarîya pêşgira (tê) bikar tê.

Ev pêşgir bi zaveke kevankî yan bazinkî didê kar. Hêja M.Mihemed dibêjê: «binçeka pêşgira (wer) diçê ser peyva (verîtin) a Avêsta ku bi wateya sûran zivirandin^{لیلی} hatiye. Hêjayî gotinêye jî ku pêşgir (wer) di zimanê Farisî de bikar nayê, eva han jî yek ji cudawazîyên zimanevanîye navbera kurdî û farisî de. Herweha zimanzanê me

M.Mehemed bawer dikê ku «karê (werîn) di kurdî de û (verîten) di Avêsta de yek tişte». ez vê raya han rast dibînim, ku eva han jî di zarêñ kudî de diyare, çaweku dengê (v) di kurmancî de dibê (w) di soranî de, ku eva han jî peyva Avêsta pirtir ronî dikê lewre em karin bêjin (verîten) û (werîten) yekin guhartinek fonitîkî biser de hatiye, ku her yek ji wan di demeke dîrokî de dijiye, ku ji (verîten) bûye (werîten), bûye (werîn) a îro. Eva han jî destûreke zimanevanîye, ta niha berdewame.

Nimûneyên pêşgira (wer):

werpêcan

werçerxan

werxistin

wergirtin

werdan (têwerdan)

werkirin (tê werkirin)

werbûn (tê werbûn, pêwerbûn)

werbandan

(Paşmaya vê lêkolînê di jimara 4 an deye)•

Kîvroşkê

tirsonek



...CO •

Hebû Mîrzo , hebû lezo , hebû hebû Mêrxaso , û hebû tirsoneko . Her çar bi-ra bûn , lê xirnik bûn , ne giha bûn .

Di dehleke mezin de , di bin qurmê dareke kevnare de dijîn .

Xirnik mezin bûn , bûne kîv-roşk , û hêdî hêdî ji qula xwe derdiketin . li geyakên dora xwe diçêrîn .

Tirsoneko newêrîbû derkeve , loma tim birçî bû qur qura nava wî bû .

Rojekê Mîrzo gote birakê xwe Tirsoneko : « Bi me re were têr geya bxwe , da tu birçî nerazî ». tirsoneko bi dilelkî xemgîn got : « Ha hew birako ! Tajîkêñ devşût rovî-

kên xwedî fen û fût , û gurên dinan bivir wê kî min jî nav lep û dina-nêwan wan derxe ! ? Ez der-nakevim ».

Hingî lezo got : « Em bezane kesek nagihe me ». Û mêrxaso got ka derkeve gepek geya bixe , ber dilê xwe hema cêtire tu ji nêza himrî .

Wilo mîrzo lezo û mêrxaso roj bi roj û hin bi hin , dûrî qula xwe diçûn , tanî nema lê vegestan . Ew dehl tev bû welatê wan . Lî tirsoneko ji bêzîravî di qula xwe de ji nêza bû pîj , û qula wî bû gora wî .

• • •



I

Tu namirî

II

Mihvan

•Bavê Candar•

Yekî şingalî nexweş ket, çû ba bijîjk. Piştî bijîjk lê nerî û derdê wî naskir, derman jê re nivî-sîn, û jê re got: «ku te dermanên xwe tev xwarin vegere ba min».


Yê şingalî dermanên xwe kirîn, tev di wê kîlîkê de xwarin, û li bijîjkê xwe vegera û got(«Min dermanên xwe tev xwarin,firavîna xwe jî bi ser wan de xwar, û va ez li ber te me».

- Ma niha ti derêن te na êşin?! bijîjk pirsî
- Na , ez bi dermanên te bûme weku hespekî, yê şingalî lê veg- erand.
- Here mirina te nîne. Bijîjk mat- mayî jê re got.

Mirovek bi mihvandarî çû mala hevalekî xwe, li wir qûnak girt, û ma. Hevalê wî piştî demeke dirêj ji kebaniya xwe re got, wê çawa be, çavên mihvanê me li neçûnê ye?!! jinê lê vegerand,ka em pevçin,û bi wî navcî nebin , belkî ji fediya bixeyide,û ji malê derkeve. Hinga bi vegevê şâ nabe

Wilo , bû qerebalixa jin û mîr, yek ji wî,yek ji wê,mihvan kete navê, lê bi wî navcî nebûn, û mîr ya dawî xiste destêن mihvanê xwe de,gava got: Bi wê oxira tu pêde herî , ev jinik bê lêdan ji van destan nafilete.Mihvan lê vegevend: bi wî avvanê ku em bi hev re bix- win destêن te lê neketin.

Hevpeyvînek bi huner-mendê çalak Aşṭî Mihdî Mihemed re .



**Hevpeyvînbir bi erebî: B.Gedro
wergêr: Dr.Ş.Bedirxan**

Berî ku em pirs û bersivên xwe pêşkeşî xwendevanan bikin em zor giring û pêwîst dibînin ku hunermendê kurdistanê bi çend rêzikan bi xwendevanê kovara pirs bidin nasîn.

Aşṭî Mihdî Mihemed hunermendekî gernas e, ji kurdistana Îraqê ye, û ta niha li wir, li paytextê herêma kurdistan «Hewlîr» diji.

Di sala 1985 an de yekem pêşangehê peykertasîn li kerkokê vekir.

Di sala 1986 de diplom ji peymangehê hunerê ciwan li bajarê sulêmaniyê wergirt.

Di sala 1987 an de pêşangehek hêlkarî li kerkokê vekir.

Di sala 1989 an de duhem pêşangehê peykertasîn li Bexda vekir.

Di sala 1990 û de sêhem pêşangehê peykertasîn li Hewlîrê vekir.

Di sala 1993 an de çarem pêşangehê peykertasîn li Hewlîrê vekir.

Ji sala 1986 an de ta niha di 12 pêşangehan li Bexda, Hewlîr, sulêmaniyê, û kerrokê, bi hunermendê kurdistanê re besdar bûye.

Aşṭî Mihdî Mihemed endamê nîqabeta hunermeden Îraqê ye.

Ew endamê komela hunermeden teşkilî li Îraqê, endam yekîtiya nivîskarên kurde, Aşṭî Mihdî Mihemed niha di rojnama «Birayetî», di rûpelê hunerê teşkilî de kar dike.

Aşṭî pêşangehê xwe yê dawî li şamê di 15.6.1993 an de bi navê hunermendekî Îraqî vekir.

Pirs- Em bi berhem û çalakên hunermendê kurd pir kêfxwaş dîbin, û bi şehnazî, bi navê gelê kurd li sûriyê te pêşewazî dîkin, û li dawîya serdana te li bajarên sûriyê li, bajarên kavdan, em lavayê ji te dîkin ku win bersivên çend pîrsên me bidin kovara «Pirs», û em te pêşda ji bo vê çavkewtinê spas dîkin.

Bersiv: Ez jî we spas dikim û ez amadem e bo bersivan. Fermo.

- Pirs: Mamostê berêz!.. ji ber ku tu hunermendekî evîndarı. kurdistan bo te çiye?

Bersiv: Kurdistan di dilê min de dilberke zindî û pîroze ji ber ku ez ji destpêka şerê netewî da, û ta rojêni îroyîn, bi hemû êş û janêne wê re dijîm. Ev evîndariya bûye beşek ji berhemên min, yên hunerî



Pirs: pêwîste rola huner di çarçewa navçeyî û netewî de raneweste, divê derbazî hundirê cîhanê be ji. vêca cihê hunerê kurdî, yê teşkilî li kuye? û çaw, hunerê me wê van herdu rolên giring bi pêkbîne?..

Bersiv: Kurdistan şûnê şaristaneke kevne, li ser axê wê dewleta Mîdyâ avabûye, li welatê me şerefyan Bedlîsi jiyanâ xwe têper kiriye (S) û her wisa ji çirokên «Mem» û «zînê şîrîn û Ferad» û «xec û siyamed» li ser xaka kurdistan derbazbûne. Lew ra em bawerdikin ku temenê mêmoyê hunerê teşkilî li kurdistanê dirêje, lê pêşketina hunerê kurdî (yê teşkilî) bi awakî baştır ji sala 1920 an de bi serpereştiya van mamostên berêz M.Şêx Norî, Felah Hesen, û Ezîz selîm destpêkiri ye, Hunerê me li kurdistanê, di demê niha de, li ser bingehê kelepûra hunerê kurdî xwe berdzike, lewra ji hunerê kurdî iro cîhekî bilind û taybetî li cîhanê heye

Pirs: Jîn bi xwe hevdijayetîke navbera rûdawêن civakêye, bê hevdijayetî jîn pêşda naçe, eva yasayeke sirûştiye, vêca ta kîjan radeyê huner, xwe bi vê yasaya xweserî ve dibestîne?

Bersiv: Dîroka bizava hevdijayetîye, ne ji iro de destpêdike, ez dikanim bêjim ew hîn ji seretaya jînê de heye, hîn gava ku mirov, ezman cêbûne dijayedî di nav rûdawêن jînê de peydabûye, wek ez zanim di dema ku Xabil Habil kuşt xuda li xabil xezibî, û tengezar bû, û hevdijayetî di jînê destpêkir, lê tevî wê jîna civakê her pêşda çû û hevdijayetî her tûjtir bû.


Niha ji eger hin hunermend berhemên nerx biha pêşkeşî civakê dikin, ew ji aliyêن hin kevne perstan de têne êşandin û hêrişkirin, lê wek tê gotin «tevî dijwariyan û astengan çerxa jînê pêşda dere» lew ra pêwîste hunermend xwe bi hêztir bibîne, û xwe di ser hemû kêmkasîyan û alozan re derbazke.

Pirs: Berêz Aşîti Mihdî Mihemed.. Cihê te di warêن hunerî, neteu, û cîhanî de li kûye?

Bersiv: Ez hunermendekî kurdim û ji navçeya Germiyan im, û li kurdistana İraqê gewre bûm piştî dijminan gundê me rûxandin ez koçî navçeya kiwêstan bûm û ji aliyê huner de ez xwe ji hunermendên cîhanê kêmtir nabînim.

Pirs: Rexnevanek dibêje: «Huner du besin hunerek keftelefêtê bi rewşê dike û bi wê re pêşda diçe û hunerek rewşê derbaz dike lew re bi (afrandin) ê nav dibe» lê win huner çawa dibînin?

Bersiv: Baweriya min wehayê: Nirîn li rewşê heyî ji mirovperwerîyê re nirîneke zîndî ye. Eger mirov li rewşê û li sirûştê temaşe neke yanê ew di xeyal û pêjnên xwe de dijî. Çimkî bûyerên me bi rewşê re rexberin hunerê teşkilî vê rêkê şanî me dike ta ku mirov bi xwe xwe nasbike wek nimûne dixwazim van navan bidim ber çavan



«Goya Farsm» şerê birakuji li Ispaniya baş nîgar-dike yan ji çawa «Van kox» di tabloya xwe de jiyanâ zeviyê çandinê xwaşik xûya dike lew ra ez kanim bêjim rewş û sirûst ji huner û hunermend re cihderên serekenin.

Pirs: kurdistana İraqê beşek ji welatê El Rafidîn e Cihê kevintirîn bajarvaniyê ye çavkaniya giyanî û wireyi مسنوي ji rojava re ci bandora vê rastiyê li ser çekirinê hunermend heye? Eyan rola vê yekê li avakirina giyana hunerî li nik te heye berêz Aştî?

Bersiv: Wek te got kurdistan ciheki dêrîne شیکەتەن Şanîder û Zerzî tê henin û ta niha bermayêن بعلابا destlatan سلسلە tê de diyarin û serdariyê mirovîn kevin wek «Nindetal» tê de berzin Gelê kurd van saman حەرە û bermayıyan û bi taybetî berhemên gelêri û kelepûri ji xwe re mal dizane. Min ev heyîna واقع di tabloyen xwe de baş diyar kırı lê ez ser vê tenê nasekinim di sala 1989 an de min dergehek kele pûrî (bi 120 sm X 100 sm) ji kêvir çêkir û li Bexdê û li balyozxana Birêtaniya min ew di pêşangehekê de nîşankir. Pêwîste ez eşkere jî bêjim îngilîzan ew

derî ji min kirîn û birin mozexanê Birêtaniya. L rastî min hemû şeweyê têknîkî di wî derî yê ke virî de pêk anî

Pirs: Rewşa bizava هەنرە hunerê teşkilî li kurdistana İraqê çawa ye?

Bersiv: Rewşa bizava hunerî li kurdistana me niha pêşda diçe hunermendê kurdistan awayê nûh fêrdibin û li ber xwedidin ku çaktirîn têknîk û mijar nîşan bidin İro şalyareta وزارت اعلام دايره rewşenbîrî û ragayandinê اعلام دايره hunerên teşkilî, ji me re bûne aligirênak çak, lê tevi alikariyê wan ji hunermendan re bidaxawa نەممە hîn zor kêmâniyê me hene û zor gerekîن دەرسىن me di warê hunerî de kêmîn yan ji bi carekê bi dest me nakefin wek nimûne kaxez pêniyîsê hunerî û h.d. Lê bê guman ev ji astengê ramyarî سیاسى û aborî yên ku destlata Sedam li ser kurdistanê ferzkirine hatine.

Pirs: Te ci bawerdikir li nav kurdêن sûriyê bibînî û te ci di çarçewa netewî û ya hunerî de dît?

Bersiv: Bi rastî berî ez serdanê زربە li kurdêن sûriyê bikim bernama min ew bû ku ez li kurdistana bakur û li تیرکیيە (Diyarbekir Istenbol û anqerê) pêşangehekê pêşkesş bikim. Lî ji ber hin sedemên taybetî min rîya xwe gewirî û ez hatim cem we. Armanca min ya yekem ewe ku ez xizmetê gelê kurd û çanda kurdi li her derê bikim û ya duhem ewe ku ez civakê kurdi û hunermendê kurd û rewşenbîrê kurdistanê xwaş nasbikim. Min pir tişt li ser kurdêن sûriyê nîzanî bû lê niha min gelek tiştên nûh nemze li bajarê Efrînê û li hawîrdora wê dîtin, û hin tiştên



taybetî min dîtin ku hesta netewî û giyana welâf- perwerî zor bilindin. Ev yeka me ji serketinê ve pir nêzîk dike.

Cudabûneke mezin navbera kurdistana Îraqê û sûriyê de heye ji ber ku ti gund û bajar li cem we nehatine kavilkirin Lew ra em pêşketinek berbiçav di warêن folklor û ayinêن kurdî de li vir dibînin.

Pirs: Bi pirbûna baweriyên felsefeyên cuda-cuda bûne erkên hunerî jî pirbûn huner ji bo huner, huner ji bo civakê huner û siyasetê Berêz Aşîtu ci kanî li ser van baweriyên ne wekhev bêjî?

Bersiv: Di baweriya min de ev ramanêñ felsefî piştî taqekirinek ~~ئەزىز~~ dirêj hatine meydanê û her yek ji wan giranîk xwe taybetî û giştî heye.

Feylesofan li gor baweriyên xwe huner ronak kirine lê «huner ji bo huner» piştî şerê cihanê yê duhem cih girt «her wisa ji» dadayîzim û «suryalîzim» jî di mosiqê şano û di hunerê teşkilî de li hemû welatên cihanê pêşda çûn.

Bê guman ez hevalê «huner ji bo civakê» û «huner ji bo rêzaniyê» me ji ber ku tenê ev ramanan kanin xizmetê civakê bikin û eger her mirovek bi serbestî û pêşketina civakê hêvî dibe pêwîste ew li ser van herdu rêçen felsefî biçe.

Pirs: Jin, evîn, welat, pêlén sêkolocî di hindî mirov de,

Bandora van hemû peyvan li hunermendan ji heye eyan çawa li te diyar dibe seyda Aşî?

Bersiv: Bi rastî di hinderê (13) salan de min pir tiş ditin şer ramyârî hezkirin barana reş hingirîn ~~cîlî~~ van hemûyan di hindirê min de tişten nûh peydakirin lê bandora evînê ji ya hemûyan bêtir li min bûye. Hunermend nikane bê evîn bijî. Bi kurtî heyînê berdiçav û sirûşt ji hunermend re cihderêñ bingehî nin.

Kek Aşî!

Li şûn paşgotina min ez hezdikim ku tu peyvekê ji gelê kurd re li sûriyê bikî diyarı.


Ez ci peyvê ji we ra bikim diyarı ew her dem hindike lê bi kurtî ez we bi navê xwe û hemû hunermendêñ kurdistana Îraqê zor spas dikim her wisa ji ez ji gelê kurd re li sûriyê spasdarim ez nikanim pêşewaziya darêñ henarê sûlava Meydankê çemê Efrînê û deş û newalêñ kur-daxê ji bikim Ez hêvidarim ku sirûsta me xem-landî, û gelê me li sûriyê bi hev re li hespê azadiyê siwarbin û bi çargavî ber ve royê bibezin Eve peyva min birayê héja.



Mirinê «Ferîde xanim» jî ji me istand



1917 - 1993



Nûri Dêrsimî. 1893 - 1973.


Tabaxa 1993 an bîst sal di ser mirina lehengekî ji lehengên dîroka kurdî nûjen re kuta kiribû, ew berêz jî dr. «Nûri Dêrsimî» bû, ku li ber lêdan û zîndanên faşistên Tirkan bi carekê sist û qels nebîbû, û jiyana xwe di hezki-rin û xizmetê gelê xwe de dîtibû, vêca, em û gelê me di vê bîranînê de bûn, ji nişkava deriya şînê careke dîtir em hilanîn, û pêlên wê li dilên me dan, û mirinê «Ferîde xanim»; hevaljiyana Dr. «N.Dêresimî» ji dest me girt, û re-vand, şîn û giriyê me nikaribûn ew ji nav lepêن mirinê vegeranda-

Erê.. em hemû stûxwar û bê hêz man, mirinê dildara me, dayika me, ji me bir, û me nikaribû ti tişt bikira. Eve qanûna vê jiyanê Bûyîn, û di dû re jî mirin, lê kesê bergeha kudi navbera bûyîn û mirinê de bi kar û xebatê dagre bi rastî ewe yê jiyaye. «Ferîde xanimê» jî ew 76 salên ku di navbera 1917 û 1993 an de tijî kar û xebat kiribû. Di rojêng teng û tehl û dijwar de giyana xebatê û pêdariyê bi dilê «Dr. N» de ber-dida, û xwe jê re dikir palgeh, da «Dr» bi ser de pal vede, û di rojêng dîtir de alîkariya wî dinivî sandina

dîrokê û bîranînên wî de, dikir. Bi rastî «Ferîde xanimê» gotina ku dibêje «Eger mîr jiyanê çêdikin, jin mîran çêdikin» bi cih anî bû, ma gelo zirara me bi çûna vê jîna gewre wê ne zor û giran be?! ma şerme gava em mîr berî jinan hêstiran li pey wê bibarînin?!..

Roja ïnê 11.09.1993 an, di dîroka me de bû rojekê bi nîşan, te digot qey mirin li pişkivîna çavên wê rojê sekînîbû, da giraniya xwe bavêje ser dilê «Xanîma» gewre. kat yet bû, her kes di nivîna xwe de razabû, tenê heyy û stêr şiyarbûn, û li hevdijayetiya xanîmê û mirinê mîzedikirin, xûyaye mirin tevî hêz û heybata xwe jî, ji kesên jîr û gewre ditirse, lew re keysa «Ferîde xanimê» di xewê de girtibû.

Bi berbunga ïnê re, nûçeya giran, û tevde şîn belavbû, û her kesê ku bihîst, li pêş mala wê civîn, û girî li wan siwar bû, lê girî ci sûde heye?! Bi nivroya ïnê re, cendekê «Xanîmê» li lehiyekê mirovatî siwar bû, û berê xwe da goristana (Zareta Henê), li devera Efrînê, ku li bakurê Helebe dikefe, lê belê nûçeya giran xwe gîhandibû xelkê Efrînê jî, lema ew jî, jin û mîr, keç û xort, hatibûn, li kêleka



rêka ku diçe goristanê, bi rêz û qor rawestabûn, û gava cendek derbaz-dibû, wan hemûyan, bi girî û şîn milêن xwe ji «xanîma» berêz re xwardikirin, da silava dawî bidin dayika dilovan.


Kerwanê tirambîlan derbaz dibe, diçe bajarê Efrînê, da «xanîmê» di ziqaq û rêkên reco û cindirêse re bigerîn e, û pişt re, vedigere, lê berî ku bighîne goristanê, xanîma delal ji tirambîlê peyadibe, û li milêن miravan siwardibe, û ber ve gora ku rehme lê. Dr - N, berî mirina xwe, jê re çêkiri bû, diçe xatir dixwaze, û li kêleka heval-jiyanê xwe, yê nemir radikife.

Belê dayika şérîn!.. Te kulek di dilê me vekir, emê bi biranîna te û ya hevalê te wê birînê derman bikin. De razê dayê, kurê te, te ji bîrnakin..

Osman Sebrî jî ji nav me barkir 1905 - 1993

**«Xwe danînim bo sitem û zorê
Divê serbilind ez biçim gorê
Gava bi rûmet çûme goristan
Hêja ye bibim lawê Kurdistan»**

Osman Sebrî



Dilawerê Zengî

Di 11.10.1993 an de, têkoşerê gewre, welatperwerê bêhempa, hel-bestvan û nivîskarê hêja Osman Sebrî li şamê li taxa kurdan li mala xwe mir. Di roja dî de ji mirina wî, birek ji gelparêz û welatperwerên kurd, û dost û hogirên wî, cendekê wî birin Dirbêsiyê li gundê Berkevirê veşartın.

Kurte jiyana «Apo» Osman Sebrî:

Di roja 5.1.1905 an de, li gundê Narincê hatiye dinê. Bavê wî Sebrî serekê êla Mirdêsan bû. ji ber vê, Osman di destpêka jiyana xwe de li ser

siwarî, şervanî, rê û rêzana êlî mezin bû.

Di sala 1916 an de, bavê wî mir. Apê wî Şukrî axa ew xwedî kir. Piştî du-sê salan Osman Li ber destê mamoste Ismaîl hişyar û serwextî gelek

tiştên çek û hêja bû, berî her tiştî rêsana êlî ya şas û çepel.

Di serîhildana şoreşa **Şêx Seîdê kal** de, **Osman** jî wekî gelek xortan dibin akama şoresê de çavên wî bişkuvîn.

Di roja 24.6.1926 an de, herdu apêن wî **Şukrî** û **Nûrî** bi darvekirin, û **Osman** û çend peyên din avêtin hindirê zindanê. Li dora du salan di zindana Denizli yê de rawestî. Rewş û jîweriya **Osman** pir zor û nexweş bû, ew bivênevê, di derya ramyariyê de dest bi avjeniyê kir. Roj bi roj welat-parêzî û miletperwerî li nik wî bilind dibû û ji bo têkoşîneke xurt û dijwar pêk dihat.

Piştî ku ji zindanê derdikeve, du rê li ber xwe dibîne. Yek riya sernizmî û xwe sipartinê, ya din têkoşînê, wî dudilî nekir, dest ji mal û milkên xwe berda, û da ser riya têkoşîn û rizgarkirina milet û welatê xwe.

Di 24.12.1929 an de ji kurdistana bakur tê kurdistana sûriyê û di **Xoybûnê** de cih digre. Di serîhildana **Agrî** de, di gel çend gelparêzan berê xwe dide kurdistana bakur. Piştî ku şerê

Agriyê bi ser nakeve dîsa vedi gere kurdistana sûriyê.

Ji sala 1931 ê heta sala 1935 an, li Filestîn û Ammanê surgûn dimîne.

Di sala 1935 an de, ji surgûnê direve, xwe digihîne êla **Berzan**. Li wir jî tê girtin, û dîsa wî davêjin girtîgehê.

Di sala 1936 an de, bi surgûnî wî dişînin Girava **MADAXAŞKAR** ê.

Di sala 1937 an de vedigere Lubnanê. Piştî ku di sala 1938 an de li Şamê bi cih dibe, li dibistana Nadî Selahedîn dersa zarokêñ Kurdan dide.

Di sala 1941 an de tevî kurê xwe «**Welat**» derbasî kurdistana bakur dibe, di pey de kurê wî «**welat**» li welêt tê kuştin.

Di navbera salêñ 1940 û 1944 an de bi karmendî li Sûriyê dest bi xebatê dike, lê di pey de bi ferмана wezîrê karê hundir ji karê xwe tê avêtin.

Di sala 1957 an de digel çend gelparêzan partiyekê li kurdistana sûriyê avadike.

Di sala 1960 û 1962 an de dîsa tê girtin.

Di navbera sala 1965 - 1969

an de dibe sekreterê giştî yê partiyê. Pişt re ji ber hin sedeman li mala xwe rûnişt û dûrî karê ramyariyê dikeve.

Bi rastî, bi van çend gotinê meyî rijî, jiyana «Apo» Osman sebrî têr nabe. Jiyana wî xelekeke ji zincîra dîroka miletê kurd e. Jiyanek berfireh û kûr e, tijî êş, derd, birçî û belengazî ye, lê ji têkoşîn û mîrxasiyê navdar e. Ji sala 1926 - 1972 an de hejde caran ketiye zindanê, sê caran surgûn bû ye, herçî salên mayî heya bi roja mirinê dibin çavdariya polisan de bû.

*«Erê Osman te agir da dilê min
Te pir kir derd û êş û hem kulê min.
Te da destê me, carek destê Ristem,
Te zenar û kemer dane milê min.
Mixabin ko tu çûyi ez tenê mam,
Li ser te her dinalî bilbilê min.»*

Cegerxwîn - Dîwana 1ê R94

Piştî ku tifing çend caran bi Osmîn re xiniz dikeve, ew xwe davêje hawara pênûsê, û ji sala 1930 - 1945 an de, ligel mîrê ronakbîrê kurda Celadet Bedir-xan û rewşenbîrên din ên kurdan di xebata herdu kovaran HAWAR-RONAHÎ yê de cihdigre.

Apo Osman netenê piştevan û nivîskarê herdu kovaran H.R bû, lê belê, Piştgirê belavkirin û tikûzkirina Elfabeya kurdî jî bû. Reng û awayên nivîsandi-nên wî pir bûn. Ci helbest, çîrokên dîrokî, serpêhatî bin, û ci li ser gerdişen kurdan, li ser yêzidiyan, li ser êl û eşîran û gelek babetên din jî bin, nivîsîne.

Di nivîs û helbestên xwe de, wî ji bilî navê xwe yê zikmakî, nasnavên Apo û Labût jî bi karaniye.

Berhemên «Apo» Osman ev in:

- 1 - Elîfbeya kurdî, şam, 1955, 56R
- 2 - Bahoz û çend nivîsên din, 1956, Şam, 68R
- 3 - Derdê me - (gotar û helbest). (?)
- 4 - Apo, «gotinê xav nepijîn bê tav» Almanya 1981.
- 5 - Elîfbîya tikûz, 1982, Şam. (?)
- 6 - Çar leheng, 1984, Şam, 40R
- 7 - Bersiva Hoşeng. 1992 Şam (?).

Çavkanî:

- Serpêhatiyê min - Osman Sebrî - (destnivîs).
- Dîwana helbestan «Apo».

21.11.1993

Şam

Namek Ji Dîrokê

Ji nemir

S.Adî re..

• Pir Rustum •

Dildar ez li benda te bûm sekinim li ser kavil... kevin-bajar malên axî yên ku dîrokê windakirin û titişt ji bili şopa ken û pis-pisa me nemaye li wan deran li benda teme û dibînim tu çawa nêñ û penîr ji dest min digir direvî, belê ez dikeniyam kenekî bi dizî, min radihişt nan û penîrê xwe, û min dizanî ku te kemend ji min re vegirtiye, lê dîsan ji ez bi ser kemenda te de dihatim, ku ez bi xefka te devim, û dûvre bigrim. xwe li ser rû zemînê tolkim, rûy xwe di rûzemînê bidim, bi hêşiran hevîrekî herî ji xanîkêñ me re çêbikim, yek caran ax diket devê min, û min bîna dîroka kotî û kortiya jêdikir, û di pişt re siya zarêñ wan tê ber çavan, zarokek li ber..çavêñ mine, wî dest avêt qopê goşt, û ji dest keçikê hevala xwe revand, hişt ku ew bigirî bi rondikêñ xwe axidem şuşt û dema bîn dikim, bîna diya min jê tê.

Dema dengêñ çiq reqa dikevin guhêñ wê, çavan radike, hildide li kûraniya aso meyze dike, siyin dûmanî têñ ber çawan, û dîrekêñ axî, tozî bi asîman de radibin, dilerizin, ew nêzîk dîbin, û zarê ku qopê goşt revandî ber bi wan diçe, destan ji wan re li ba dike, ji siwarêñ kuştin û talanê re destan

bihejîne, rû, dêm berkenî, ken û şahiya zarokî di çavan de roniya EHORA-MASDA. Lî EHRI-
MAN li hemberî wî bû, Ew tîrê reş tîrê sergonê didwan ji kevanê dertê, berkenî û roniya Ehora mazda du par dilerize dikeve.

Dildar min nizanî ku li bajarêñ mezin ji tere kemend vegirtine, û li hêviya niçîriya tene, ji te, ji min pariyêñ nêñ û penîr... newrozê bi dizin, û ji nûve hêşirêñ xwînî bibarînîm.

Ey pêlêñ di ser cendekê minî arî re diqulipin, werdibin, ey derya dikele, kanî pêla minî viyan, çi masiyê mezin daqirtand.

Xwîna sor dagerî, diherikî, siwarêñ kuştin û talanê tê de gevizîn, tevî axa Ararat bû, û hes-
teyên wî zaroyî hûrkirin, goştê telmeyî di bin pan
û nalêñ hespêñ xwede kirin hevir, li şûn xwe hiş-
tin, siwarê dawî rumâ xwe di heriya bi xwîn de
vedine, radike devê xweyî atûnî dimije.

Dicin, dimeşin, li wan deveran talan dikirin.

Keçik temaşa wan dike, şikeftêñ wanî biçük,
yên bi zil û çovêñ Enabê avakîri, şewtandin, hil-
weşandin, serê bûka meyî kevirî hûrkirin, herifan-
din, û guloveren sor, yên bi mij û dûman di çavêñ
keçikê de vedimirin.

Dayê derya bahozî bigire.hembêzke.pêla minî sor nahêle bikeve binî belê wilo jorde hildin.rahêjin ser milan,ez hîn li bendême .

Wê dinêrî, temas dikir, temaşa lekên sor, ew heriya xwînê,ew hevalê pelixî. Dema ku erd hejiya,teqiya, ji ûrê xwe etûn avêt,û ji desşta müşê, ji nav pelên lûlû û kaşîyan ew pehlewan Akîm Akrîm dertê.

Derkevin,birêkevin,têvedin.Ey pêlên dojehî,û siwarêñ kuştin û talanê daqurtînin.Bila pinpinok û gangiliyêñ sor li deşt û çiyayêñ welêt serî hildin.

Dildar,ez li hêvî û benda teme,tu kanî,cîma

nayê.Were were li cejin,di newroz,na,na,tu li cihê xwe bimîne tev hevalên xwe ezê bêm û li te bibim mîvan,teví tebim,bi tere buhiştê par bikim, Li benda min bi-mîne,va ye newroz tê,newrozek nû,deryak bahozî kûr,û firehtir û martîrên nû.

Dîlbera te

Yara

Tebîn:

«Ev name di kavileki de li ser çermê zarokeki hatibû nivîsin û tiştê em pê rabûn me jê wergirt».

Stranêñ feqa

Stranêñ Folklorî

● M.H.Darî ●

1) Xesiwê

Mê yellâ û maşella
Mê yellâ û maşella
Mê yellâ û maşella
Mê yellâ û maşella
Mê yellâ û maşella
Mê yellâ û maşella
Mê yellâ û maşella
Mê yellâ û maşella
He yellâ û maşella
He yellâ û maşella

yar xesiwê xesiwê
heft gura qirik jiwê
navê xeswam Eyşikê
bi ser minde siksik kê
ji bona kevçîk tirşikê
navê xeswan beyazê
bi ser minde kaze kaze
ji hona pelek pîvazê
xwezi xesû nebana
sindoq bê mifte bana

He yella û maşella
He yella û maşella
He yella û maşella
He yella û maşella
He yella û maşella
He yella û maşella
He yella û maşella
He yella û maşella
He yella û maşella

2) Derxîrin bûkê
Min holek çêkir
wêj darê darê
çend kaşo lêde
hol hate xwerê
derxînin bûkê
ser jêkin kerê

Min holek çêkir
wêj darê biyê
çend kaşo lêde
hol hate si yê
derxînin bûkê
ser jêkin miyê

Min holek çêkir
wêj darê merxê
çend kaşo lêde
hol hate çerxê
derxînin bûkê
ser jêkin berxê

heft bar melîl hebana
bûk jî bi dest xwe bana
xeswa bajon kadîna
lêkin cila mihîna
bê av û nân bi mîna
heqê bûka bistîna
yan xesiwê xesiwê
heft guna qirik ciwê

xezalê zer bûme ez
bi ser de talan bûme ez
xezalê zer bûme ez
bi ser de tulan bûme ez
xezalê zer hûme ez
bi ser de talan bûme ez

xezalê zer bûme ez
bi ser de talan bûme ez
xezalê zer bûme ez
bi ser de tulan bûme ez
xezalê zer hûme ez
bi ser de talan bûme ez

xezalê zer bûme ez
bi ser de talan bûme ez
xezalê zer bûme ez
bi ser de tulan bûme ez
xezalê zer hûme ez
bi ser de talan bûme ez

Pirs dipirse..!

«Pirs» dipirse: rewşa helbestên me yê hevdemî ci ye?!

- Her wekî em dizanin hênanê (regezên) helbesta helbest ev in:

1 - Hestekî rastego.

2 - Peyvine helbijartî.

3 - Rananeke hêja.

4 - Kêseke Mûzîkî.

5 - Ristineke rewanbêjî û nûjen.

Bi karanîna evan hênanan yan jî hindekan ji wan helbesta bilind û akanker pêk têt.

Ji ber ronahiya evê pêşgotina jorîn, gelo em ci dikarin derbareyî

helbestên xwe , yên hevdemî , li sûryayê bibêjin?!

Bêyî ku em helbestvanekî binav bikin, yan jî dîwanekê nîşan bikin, helbestên me berhemekî nepijiyayî-ye, hâvileke beranêtî ye. Nexweşıya me ew e, ku em vacî hemû helbestvanen cihanê kêm dixwînin, û pir dinivîsin. Helbestên me jî, yek ji ancamên nexweşıya me ne.

D.Abdulfetah

○○ Şexê Rêrast ○○

Berî her tiştî sipasîya «pirs» ê dikim, ku birastî dixwaze birînên toreya kurdî bide berçavan, û dermanke, û berê wê ber bi pêş veçûnê de bide.

Heger mebest ne ew be pirsa «pirs» ê wê bê wate û bê sûde be.

Birastî em bi çapkirîn û weşanên kurdî re xwe şâ û bextewar dîbînm, çap û weşanên vê demê lehîyeke li gor demên bûrî, lehîyeke fereh û mezine, em bi hêvîne ko lehî bine,

û bimeye, avek zelal jê biherike, berhemên qenc jê biderkevin serê me kurdan, û bi taybetî kurdên sûriyê, cîgeha gezîna toreya kurdmancî, cîgeha lehengên kovarê giranbiha . Hawar, Roja nû, Ronahî pê bilindbikin, ew jî ji me re bibin jêder û lêveger.

Heke em bi hûrbînî li helbestên vê demê binêrin, û bidin beranberî helbestên dema Hawarê, em nîr û demejî bidin alîkî, dîsa emê çiqasî xwe biçûk û şûndemayî bibînin , heke em xwe bi yên

kilasîkî re jî tayîkin, alîyê şahîna «mîzîna» me wê bi banîkeve, heger em xwe bi ya zargotinê ve jî bipîvin, dîsa pêşketin wê ne li alî me be!!! pirs çîma? û ci divê?

Divê arama me hinekî hebe, lezîn tunebe, ezezî hinekî kêmbe, bendorâ çand û toreyê baş nasbe, hinga birînê me, wê werin kewan-din û dermankirin.

Li ser durv û naveroka helbes-tan ez karim bêjim, ez bi helbesta

aza re bêtir kêfxwes dibim, lê hel-best helbeste, ci kilasîk dibe, ci aza û nûjen dibe, ger xwedîyê wê hel-bestvan be ne helbestkarbe, hel-bestâ xwe, bi xwe afirandibe, ne hatibe çêkirin, yanê helbestê hel-bestvan afirandibe, ne helbestkar helbest çêkiribe.

Hêvî bilinde ji nav lehîyê hel-bestan helbestvanin berêz, gewre û nûdem bi derkevin.

○• JAN DOST •○

Di nerîna minde ev ne helbestin, lê xêzikin. Bi tîpêñ kurdî ne, her yek ji xortêñ me hînî xwendin û nivîsandina kurdî dibe, di dilê xwede dibêje ez bûme ristevan, û dest bi çapkirina Dîwana 1 an dike, û ya 2 an di bin çapê de ye, ev kes di bin siya konê cegerxwîn de paldayî ne, û hawê helbestê wî dikin, ji millet re dibêjin ji xew rabin, lê millet ji xew rabûye û taştê jî xwariye!!!

Ez navê tu kesî nabêjim, lê tevdê hêkê mirîşke-kê ne, sûc jî ne ê wane, sûc sûcê ê ku ji wan re li çepka dixin, û ji wanre şabaş dibê-jin, û fedî dikin ji wan re bêjin ev

ne helbestin.

Pêşketina helbesta kurdî, di nerîna minde, li ser Rexne û wergerandinê ava dibe, û divê em hay ji berhemên ku bi zarê soranî dertêñ hebin.

Şerme heta niha em nizanibin helbestek goran. Bêkes, Haçî qadir bi xwinin, û fam bikin.

ez nabêjin ku bi carkê tiştêñ dertêñ xav û rijî tamsarî ne, bi rastî di nav de hinek xwes dinvîsin, lê ew jî bîna wergerandinê jê tê..

ez bi hêvî me rista kurdî pêş-keve li vir, û xwe bighîne ya ku bi zarê soranî der tê, û zorspas.

Heleb 25.2.93

• Mûmê welat •

Gelek spas ji,pirs,û pirsa wê re .

Bi kurtî li ser helbesta nûjen li sûriyê,ezê bêjin pir girin-ge ku,Çerx û nîrên dema ku torevan,an hunermend têde dijî em zanibin,ger Nirxkirina⁽¹⁾ wan daxwaziya mebe.

Toreya me,çi helbest,çêrok,û roman be,di roja iro de wek balinde⁽²⁾ yekî girti ye,û dixebite ku xwe ji nav têlan azake,belê cihê wî ezmane,lewre divê li ber çavan be ku:

1 - Tune bûna dibistanê kurdî û rik gîriya⁽³⁾ dekên⁽⁴⁾ rêjîmén li pey hev di windakirina kurdan û zimanê kurdî bi her şêwa⁽⁵⁾ ye kî.

2 - Mêtina zimanê êrebî ji cûkanîde,ta kutakirina xwandina zanîngehî.

3 - Xawêlkegiya⁽⁶⁾ zimanê kurdî ji gelemeperiya kurdan,ta demek dirêj.

4 - Kêmbûna pirtûkên kurdî,ji bilî qedex kirinê û tunebûna pirtûk,an lêkelîn,an gotaran di warê nirx û rexne-kirina coreyên⁽⁷⁾ toreyî,ên kurdî de.

5 - Rewşa aborî,ya ku ji her kesekî 24 katan kar dixwaze,û torevanê bê kar..nêrîneke bazirganî li berhemên xwe binêre,û li ber hêviyekêbe.

6 - Kêm xwandina zimanê kurdî û dûrbûna piran ji rewşa çanda cîhanî.

7 - Kêm zanîna me bi bingehiyêن rêjîmén nivîsandinê,

8 - Tilvizyon.. (dizê li ber çaran).

ji ber ev egerên⁽⁸⁾ jorî,û tevî piraniya dîwanê weşîne,an helbestên di kovaran de belavbûne qelsin,û tengbûna çembera wan baş dixwîne,di

warê naverok û durvde,ger ew berhem xêzek çêrok be,an malikek helbest be,ha-vil û sûde ye li baram-berî ev nîrên li jor hatine.

Bi carekê,ne xeme ger durvê helbestê kilasîkî, an nûjen be,lêbaše ku em zanbin ya kilasîkî jî ereban giha me,ji dema îslaman de.

Helbesta nûjen çîye?

Raste nûjen kirina helbestî hat bi aza kirina ya kilasîkî ji bar⁽⁹⁾ û kêşan⁽¹⁰⁾,Lê hin tiştê dî hene, pêwîste ku li ber çavan bin ji her du core yan re wek:

- Bi xwe hatina peyvekê,û her gotîne-kê ne ava bûbin.

- Dema pişkan⁽¹¹⁾ û rola vê yekê.

- Nivîsandina gor rêzman,ne ciwan û xoş kirina zîmên!

- rola bernavan,bi hemî coreyên wan.

- Zanebûna dengdariya tipan,di her peyvekê de (Fonitik).

- Girêdana wêne bi wate⁽¹²⁾ ya wêve .

- Xiste kirina hevrêzan û H.D..

Lewre bi rizgarkirina helbestan ji bare û kêşan, û gotinêne girîng nûjen na be,û pir gotin û gotar li ser vê babetê hatine,û hîn berdewa min, û kes ne gîhiştî rêjîmeke durust,serbixwe ji helbesta nûjen re.

Lê divê em bi rengekî, awakî,ramanin nû, bi şewazekî⁽¹³⁾ nû biramin,bi nêrin,Binivîsin li gor ev dem û berebata⁽¹⁴⁾ Alîktron û kombyoter,bê yî em ji weşa Mirovanî bi dûrkevin.

Û hêviya xwe,tev ya şérko bêkes dikim,û ezê bêjim bi zimanê şîrmakî binivîsin,û di hemî tore yên cîhanê de qenc û ne qenc heye,û ger îrc

şihîna⁽¹⁵⁾ mirixkirinê ji rewşê windaye, pîware ye⁽¹⁶⁾
demek wê bê, û bi hêsanî ewê yê ne qenc û bazir-
ganî û yê ji dil de, ji hev cudabike, û tim û tim
tiştê rind û hêca xwe diçespêni û beramberî pêl
û bahozan xort dimîne.

Ez ne rexnevanim, û hêviya min ji wan, ku her
babetekê bikin lêkolînek, û ronahiyê bi din qun-
cên tarî, piyên xwe vemalin û dakevin rewşê
çimkê bê rexin helbestvan wê tim di cihê xwe de
here û were.

Dîsa sipasî ji „pirs, û endam û mîvanêن wêre, û
ji gelê mere.

1 - Nirx: قیمة

2 - balinde طیر

3 - rikgirî	تعنت
4 - dek	سياسي
5 - şewe	اسلوب
6 - xawêlke	مهمل
7 - core	نوع
8 - eger	سبب
9 - bare	قافية
10 - kêşan	تصريف - اوزان
11 - pîşk	فعل
12 - wate	معنى
13 - şêwaz	اسلوب
14 - berebat	جبل
15 - şihîn	ميرزان
16 - pîware	غائب





Bajaré Efrin



Osman Sebrî jî ji nav me barkir
1905 - 1993